

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Hejmar: 5  
Sal: 1  
Sibat 1993  
Biha: 10.000 TL

## Pirsgirêka Bosna: Zalim yek milet in, mazlûm yek milet!





www.artsvakuo

Xwedî  
(Sahibi)  
**MAHMUT YARLUG**  
•  
Berpirsiyarê Giştî  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
**SABAH KARA**

Berpirsiyarê Nivîsaran  
(Sorumlu Yazı İşleri Müdürü)  
**SÜLEYMAN ÇEVİK**  
•  
Mudîrê Dezgahê  
(Müessese Müdürü)  
**MÜŞTEHİR KARAKAYA**  
•  
Muşawirê Nivîsaran  
(Yayın Danışmanı)  
**MUSTAFA GOYANİ**

**nûbihar** kovareke mehanî ye  
ku bi weşandina karpêkên çan-  
da Kurdi bi mana tevayî dilebi-  
ke. Raman û rayên xwedyên  
karpêkan, lizûmen ne raman û  
rayên **nûbihar** in. Nivîsaren ku  
bi îmzeya Berpirsiyarê Giştî we-  
ya bi navê **nûbihar** têr weşan-  
din raman û raya **nûbihar** nîşan  
didin. **nûbihar** di serrastkirina  
karpêkên şandî de azad e.

•  
**Bedela abonetiya salinî:**  
**Li hundir:** 120.000 TL  
**Li derive:** 50 DM

•  
**Postgiro** (Posta Çeki):  
Süleyman Çevik, 658265

•  
**Jimareyên hesabbankî:**  
**Li hundir:** Süleyman Çevik, İş  
Bankası Yavuzselim Şubesi,  
1079-300-235999  
**Li derive:** Süleyman Çevik, İş  
Bankası Yavuzselim Şubesi,  
1079-30100-3118770

•  
**Navnîşan** (Adres):  
Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No:51/3  
Fatih-Istanbul  
Tel: 533 75 88

•  
**Tîprezi** (Dizgi):  
**nûbihar**

•  
**Berg** (Kapak):  
**DÖNÜŞ**

•  
**Çapxane** (Matbaa):  
**MUTLU OFSET**

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

## DESTPÊK

- Li zimanê xwe, li kovar û kitêbên xwe  
xwedî derkevin! ..... 3
- **nûbihar**

## SERNIVÎSAR

- Pirsgirêka Bosna: Zalim yek milet in,  
mazlûm yek milet! ..... 4
- **SABAH KARA**

## BERG

- Ev şer, şereke hezar salî ye ..... 9
- **SÜLEYMAN ÇEVİK**
- Durûtiya Roava: Aspirîna Somalî bi xwîna  
Bosna bi me didin xwarin ..... 11
- **N. EBDİLAH ê QISQANÎ**

## AYETNAME

- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd ..... 7
- **AZAD ZELAL**

## LÊPIRSÎNA "PIRSGIRÊKA KURDAN"

- Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran ê kovara  
"Yeni Zemin" **OSMAN TUNÇ** ..... 16
- Berpirsiyarê Giştî yê kovara "Yeni Zemin"  
**MEHMET METİNER** ..... 18
- Sedema "Pirsgirêka Kurdan"  
Emerîka û rejîmên dûvik in ..... 20
- **EBDİLAH AMED**
- Hevpeiyîna heftenameya "Azadî" bi  
Berpirsiyarê Giştî yê me **SABAH KARA** re ..... 23

## BANÛNAME

- Barê çaxekî li ser milê dayikan ..... 13
- **MİHRİCAN DOĞAN**

## HELBEST

- Nameyên bêcewab / 4 ..... 14
- **SABAH KARA**
- Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhemmed ..... 26
- **YÜNİS EMRE / HOZAN OFLAZ**
- Çin çin kirin zulfân siya ..... 31
- **MELA EHMED ê CİZİRİ**


## DIMILKİ

- Qelbê mi dinyay rê beso! ..... 30
- **MUHAMMED PAŞA**
- Nê hêsrî, hêsrê çimandê toyê dayê ..... 30
- **OMER FARUK ÇETINKAPLAN**

**FERHENGOK** ..... 31

**RÊZEPIRS** ..... 32

**ALİ KEÇELİ**



# LI ZIMANÊ XWE, LI KOVAR Û KITÊBÊN XWE XWEDÎ DERKEVIN!

**X**wendevanê hêja! Dijminê me, dijminê milet, ziman û her cûr mewcûdiyeta me, naxwazin em bipêş de bikevin, naxwazin em ji weke hemû mîletên azad û serbixwe, azadane û birûmet bijn û mewcûdiyeta xwe bidomînin. Loma wezîfeyen pîr mezîn li para me hemuyan dîkevin. Ji zarokan heta nûciwanan, ji ciwanan heta xortan, ji mîrân heta jinan û ji pîremêran heta pîrejinan, gereke em hemû dest bidin hev û ji bona domandin û bipêşde birina mewcûdiyeta xwe, ziman û çand û huner û edebiyata xwe, em seferberiye pêk bînin.

Heval û hogirê hêja! Îro vaye, ji Xweda re şukir, ji bona me Kurdan dewreke nû dest-pêkiriye. Ko em bikaribin ji vê fîrsendê baş îstîfade bikin, dibe ku halê me mazlûman bibedile, ronesansa Kurdan ji nû ve destpêbike û Selahedîn ên nû, Mela Ehmed ê Cizîri yêñ nû, Ehmed ê Xanî yêñ nû, Şêx Seîd ên nû, Seyid Riza û hwd ên nû derkevine holê.

Xušk û birayêñ hêja! Werin em hemû, wezîfa ku li para me dikeve, em pêk bînin. Êdî wext ne wextê raketin û rawestinê ye.

Kitêbêñ hê nehatine nivisandin li benda me ne. Wêneyêñ hê nehatine kişandin li benda me ne. Lo hawar! Me êdî em ci bîbêjin? Erd û azman li benda me ne. Ax û kevir li benda me ne. Dar û giya li benda me ne. Însanêñ mazlûm li benda me ne; însanêñ reben!

Rabin ser xwe xušk û birano! Pirr bixwînin, destê hevûdu bigrin, hev bibînin, li hev xwedî derkevin û pirr binvisin; pirr, pirr, pirr binvisin!

Xweda re şukir, têra xwe nivîs û name dighin destê me. Roj tîneye ku çeperker (:postçî) dest tîjî bi ser me de neyê. Lîbelê hê bi çewalan nivîs û name ji me re nehatine. Gereke çeperker her roj bi çewalan nivîs û nameyêñ we ji me re bînê.

De haydê xušk û birano, ez we bibînim! Nîşan bidin ku hun hene û hun namrin! Nîşan bidin ku

diyên Kurd ci egitmîr û egitjinan welidandine û dê biwelidînin! Nîşan bidin ku yê ji we re dibêjin "kiro", ew bi xwe "kiro lawê kiro" ne!

Nezanî piştâ me şikêndkiye xušk û birano! Gereke em seferberiya zanabûn û rewşen-bîrbûnê pêk bînin û vê seferberiyê ilelebed bidomînin.

De haydê ez we bibînim!

Sernûçeya vê hejmara me, "Pirsgirêka Bosna" ye. Weke ku em Kurd in, em misliman in ji. Loma me xwest ku dijmin nebêjin "Evan ji bil Kurdistiyê, li ser ti tiştî din nasekinin!" Me xwest ku em derd û elemêñ birayê xwe yêñ misliman bînin zimên û em bibin şîrikê derd û elemêñ wan.

"Pirsgirêka Bosna" weke "Pirsgirêka Kurdan" birîna me hemû mislimana ye. Lewra ji ber ku ew misliman in, ev zîlm û zordestî li wan dibe. Naxwe gereke em li wan xwedî derkevin.

Tîştek din heye ku em dixwazin wê ji bîbêjin: Heta ji destê me werê, em ê nameyêñ Kurdi yêñ ku ji me re têñ, biweşînin. Nebû, em ê tadada rûpelêñ xwe zêde bikin. Lê heta ku ev rûpelzêdekîrin pêk werê, gereke xušk û birayêñ ku me nikarî em name û nivîsê wan biweşînin, li qusûra me meyze nekin.

Helbet yêñ ku dixwazin name û nivîsê wan di *Nûbîhar* de biweşîn, lazime nivîsê xwe bi Kurdi binvisin û ji bona ku em karibin rûpelêñ xwe zêde bikin, gereke arîkariya me bikin, aboneyan ji *Nûbîhar* re peyda bikin û milê xwe bidin bin vî barê giranbiha û pirr bi qîmet.

Ji *Nûbîhar* re aboneyan peyda bikin. Lewra ev, pirr giring e û domandina vê xebata giranbiha, bi vê yekê ve girêdayî ye. Loma yêñ ku dixwazin ku jîyana kovara me ya hêja *Nûbîhar* pirr dirêj be, gereke jê re aboneyan peyda bikin.

Heta hejmara hatû; selam û rehmet û bereketa Xweda li ser we hemuyan be!



# PIRSGIRÊKA BOSNA: ZALIM YEK MILET IN, MAZLÛM YEK MILET!

*Xusûsen em Kurdên ku me pirr jenosîd  
û van cûr zilman dîtiye û em dibînin,  
gereke em li ber vê zilmê  
bêdeng nemînin.*

**H**eyf li me ku li ber vê zilma ku em di bin barê wê de dinalin, ku ne em tenê, erd û azman dinalin, giya û heywan dinalin; ti tişt ji destê me naye, ji bil hawarê!

"Kî însaneke ku tikesî nekuştiye û di serzemînê de fesadê dernexistiye bikuje, weke ku hemû însanan kuştiye. Û kî însanek jîndar bike, weke ku hemû însanan jîndar kirîye." (Sûreta Maîde, 32)

Wextê mirev însaneke bêguneh bikuje, ko halê wî wisa be, ma wextê ku bi sedhezaran însanên bêguneh bikuje, gelo halê wî çiye?

Erê, Qur'an a Mecîd wisa dibêje. Ne iro bi tenê, ev hezar û pênsed sal in vê

## SABAH KARA

dibêje. De werin li van wehşiyênu ku ji mislimanan re dibêjin 'murteci' binêrin û bibînin ku 'murteci lawê murteciyan' kiye, 'wehşî lawê wehşîyan' kiye?

Agir bi serê me mazlûman de dibare, ji terefê van 'bipaşdeyên' ku navê wan 'bipêşde'

ye û ji terefê van 'murteciyên' nav 'mutereqqî'.

Dinyayê li me kirine zîndan. Her cih û her der buye weke goristanê.

Her meriv buye mîna cesed. Em kirine miriyên bican. Ti tiştê van zaliman ne însanî ye.

Zarokan dikujin, zarokan! Determînzma tarîxê, yanê sunet û qanûna Xweda ya li serzemînê hakim, nebediliye û nabedile:

Kufr yek millet e, Îslam yek millet!

Yanê zalim yek millet in, û mazlûm yek millet!

"Heta ku tu nekeve dînê wan û nebe ji wan, Ci-hû û File ji te razî nabin. Bibêje: "Hîdayet ewe ku



ji canibê Xweda hatiye." Heger pişti vî hemû ilmê ku ji te re hatiye tu bibî tabî hewa û hewesên wan, dê ji te re ji canibê Xweda ne dostek hebe û ne arîkarek." (Sûreta Beqere, 120)

Naxwe malûm e ku kafir li ber tevkûjî û jenosîda kafîrên sa yên Sirb ku di Bosna'yê de didomînin, cîma evqas bêdeng in.

Hun dibînin ku yek-bûna nijadiyê nekaflî ye. Lewra Boşnak jî bi Sirban re ji yek eslî ne, nijada wan yek e.

Hun dibînin ku hevelatî jî nekaflî ye. Lewra Boşnak û Sirb û yên din hemû ev çendîn sedsal in di yek welatî de pevre dijîn.

Naxwe çî?

Naxwe ev pirsgirêk, pirsgirêkeke dînî ye!

Naxwe kufr yek milet e, li hemberê Îslam a yek milet!

Gawirêz zâlim yek milet in, li hemberê misliman û mazlûmên yek milet!

Naxwe weke ku Qur'an a Mecîd dibêje, kafir ji me razî nabin û me qebûl nakin heta ku em nekevin dînê wan.

Çîma Hirvat û Sirb lev nakin? Lewra Hirvat Katolîk in û Sirb Ortodoks. Loma Rûs û Yûnaniyê Ortodoks li Sirbê Ortodoks xwedî derdi Kevin û dewletê Ewrûpayî yên Katolîk, li Katolikan xwedî derdi Kevin.

Gelo ev çî hal e ku Rûsên ku ev çendîn sal in komünist bûn, hê jî di bin tasîra Ortodoksiyê de ne?

Lêbelê were li vî halfî mîzeke ku, ji kîja nijadî û ji kîja dînî bin, kafir hemû li ber misliman yek cebhe ne.

Tu li Butros Galî yê Ereb mîzeke ku di cebha kafîran de ye!

Cîma?

Ji ber ku ew jî kafir e!

Êdî 'şefeqa derewîn' komunîzm, ji holê rabû û du cebhe di masetê de man: .

Cebha Îslamê û cebha Kufrê,

Cebha Ronahiyê û cebha Tarîtiyê,



Cebha Heqî û cebha Neheqî,

Cebha Edaletê û cebha Zilmê...

Ev wext û hengama ku em tê de dijin, eynen mîna wê hengamê ye ku Îslam hate holê.

Wextê ku Îslam hate holê jî, halê dînayê mîna îro bû:

Wî wextî Împaratoriya Rohilat, yanê Împaratoriya Pers

hêdî hêdî difeskîlî û Împaratoriya Roava, yanê Împaratoriya Rûm jî hêdî hêdî pare dibû Weke fro ku Împaratoriya Rûm feşkîlî û Împaratoriya Rûm yanê Împaratoriya NATO, yanê Împaratoriya Amerika û dosî û yarê wê yên Ewrûpayî, vaye hêdî hêdî ji hev pare dibin û nikarin ti ûmêdê bidin dînayê. Ketine dawa menfaetê û her yek ji wan, li menfaeta xwe digere.

Yanê dînya cardin li benda Îslamê ye û ev dîroka avis, bihemîlî 'Mesîh ê Xelasker' e.

Bila ev li vir be û em cardin vegerine Bosna...

Bosna çiye? Boşnak kî ne?

Dewleta Osmanî sala 1354'an de ji Gelibolu buhurte Ewrûpa û sala 1361'î de Edirne stand û ji xwe re kire payetext. Lêbelê fetha Bosna pirr dûvdîrêj bû û encax piştî sed salî, yanê di tarîxa 1463'an da Osmaniyan karîn mintiqâ Bosna fetih bikin.

Feeqîr û belengazên mintiqê, serketin û se-refraziya Osmaniyan li ber Fileyan, bi kîf û şadî pêşwazî û qebûl kirin. Gelek ji wan, bi xwestin û ji dil û can Îslamê qebûl kirin û bûne misliman. Bi vî awayî di mintiqê de qismek ji xelqên Slaw ên ku bi zimanê Sirb-Hirvat dipeyivîn, daxîlî cemiyeta Îslamê bûn, ku navê wan 'Boşnak' e.

Dewleta Osmanî di mintiqê de ji bil bac (:vergi) standin û tamîn kirina asayışê, bi ti tişte xelqên mintiqê mudaxele nedîkir.

Malbatê Boşnak ên misliman di Dewleta Osmanî de wezîfeyen pirr giring girtin. Pênc

wezîr û du sedrazemê Osmanî ji van malbatan hatin, ku yek ji van sedrazeman ji Mehmed Paşa yê Sokolî ye.

Lê wext buhurt û Dewleta Osmanî bi paş de ket û mecbûr ma ku mintiqê texliye bike. Di tarîxa 1878'an de Osmanî mecbûr man ku idara mintiqê berdin destê Dewleta Avusturya-Macarîstan. Lêbelê her ci idara Bosna ne di destê Osmaniyan de be jî, li gor peymana ku di nav Osmaniyan û Dewleta Avusturya-Macarîstan de pêk hatibû, ji vê tarîxê û pê de jî li ser mintiqê, ko bi şiklê sembolîk be jî, nufûza Osmanî dom dikir. Yanê mintiqe di bin wesayeta Osmanî de bû. Lêbelê perîşaniya mislimanan li vir nema û nîhayet di tarîxa 26 Sibat 1909'an de Bosna bi şikleke qaşî ji destê Osmaniyan derket. Han, derd û mazlûmiyeta Boşnakان ji vê û pê de hê jî kûr bû. Keriya berxan ji vê tarîxê û pê de kete destê guran.

Bosna di tarîxa 1918'an de, bû parek ji dewleta nû ya Yugoslavya. Lêbelê ji ber ku hakimên vê dewleta nû jî Sirb bûn, îxtîlafa wan û mislimanan dom kir.

Bosna di nav tarîxên 1941 û 1945'an de, bi dewleta rizgar a Hirvat ve hate girêdan û ji sala 1945 û pê de, bû cumhûriyetek ji cumhûriyetên Dewleta Federal a Yugoslavya. Û weke ku ev hemû nebes bûn, ev dewra nû dest pê kir û gawir bûne qesabê mislimanarı.

Di sala 1990'ı de piştî Împa-

ratoriya Soviyetan, weke saîr dewletê peyk ên tabiê vê imparatoriyê, Yugoslavya jî ji hev feşkilî. Loma Bosna jî xwest ku ew jî weke Slovenya, Hirvâstan û Makedonya, ji Yugoslavya cûda bibe û bibe dewleteke serbixwe.

Ji bo vê yekê di Adar a



1992'an de mislimanen Boşnak referandûmek pêk anîn û ekseriyeta vî gelî, meyla xwe li alî rizgarî û serxwebûnê nîşan da. Lêbelê dewleta Sirbistan û Sirbêni di nava Bosna'yê de, vê rizgarî û serxwebûnê qebûl nekirin. Loma bi mislimanan êris anîn û şer dest pê kir. Gawirêni Sirb, pişta xwe dane hîmaye, palpişt û desteka dewletên Rova yên File û gawir û dest bi jenosid û tevkuji û bênamûsiyê kirin. Û ev bênamûsi û bêşerefiya wan, iro jî bi hemû şideta xwe ve dom dike.

Ma êdî ez ci bibêjim? Her tişt vaye li ber çavan diqede.

Gawirê Sirb bûne heval û hogirê Dehak û Hîtler û Sedam.

Zarokan digurînin, pîremêr

û pîrejinan dikujin, kampê tecawuzê çekirine û bi sedhezaran jin û keçen misliman êxistîne wan kampan de û bidom li wan tecawuzê dikin. Ji tecawuza van gawiran, heta zaraken heft heşt salî jî xelas na-bin.

Ma gelo ti xwedyê me mazlûman tineye?

Ma ci li me hatiye ku em di riya Xweda de û di riya pîremêr û jin û zaraken ku dibêjin

"Ya Reb, me ji vî diyarê zaliman derxîne, ji me re ji canibê xwe arîka-rek bişîne, ji me re ji canibê xwe xelaskarek bişîne!" em cengê nakin (Sûreta Nîsa, 75) û em bavê gawiran naşewitînin?

Helepçeve nû dest pê kiriye û hezar car ji Helepçea ewil mestir û wehşîyanetir!

Ho hevalino!

Ho birano!

Ho mislimanino!

Ho nivîskarino!

Ho şairino!

Lo hawar!

Ma êdî ez ci bibêjim?

Yêñ ku weke mîran şer nakin, wê tim ì tim girî û hawarê bikin!

Ger iro dora Boşnakان be, kî kare bibêje ku dê sibe ne dora me be?

Û xusûsen em Kurdên ku me pirr jenosid û van cûr zilmân dîtiye û em dibînin, gereke em li ber vê zilmê bêdeng nemînin!

Lewra weke ku zâlim birayê hev in, mazlûm jî birayê hev in!

De birano, rabin ser piyan û ji vê zilma cîhanî re bibêjin 'Na!'

# ÇEND AYETIN JI QUR'AN A MECÎD

*Weke ku xuwendevanên me zanin, em di her hejmara xwe de çend ayetan ji Qur'an a Mecîd diweşînin. Heta nuba me Sûreta Fatîhe û 100 ayetan ji Sûreta Beqere weşandin. Em ê înşelab di hejmarê xwe yên hatî de jî vê xizmetê bidomînin. Di vê hejmara me de ayetên 101 ila 125 ên Sûreta Beqere li jêr batine.*

## SÛRETA BEQERE

*Bi navê Xweda yê arîkarîxwaz û bimerhemet.*

101-Wextê ji canibê Xweda peyamberek ji wan re têt ku tiştê li cem wan (:kitêba wan) jî tesdiq dike, hinin ji yên ehlîkitêb, weke ku jê bêxeber in, kitêba Xweda avêtin pişt xwe û red kirin.

102-Evan, bi tiştê ku şeytan di heqê padışahiya Suleyman de digotin tabî bûn û wan qebûl kirin. Suleyman kafir nebû, lê şeytanê ku sihr û cadûkeriyê û tiştê ku ser du melekên Babîlî Harût û Marût nazil buye bi xelqê dielimandin, kafir bûn. Lâbelê ew herdu heta ku ji xelqê re nebêjin ku, "Em fitne (û îmtîhan) in; nebe ku hun bibine kafir", tiştêk bi wan nedielimandin. Lâbelê ji wan (herduyan), tiştê dê nava mîr û jina wî veke (û wan ji hevûdu dûr bike) dielimîn. Ewku ewan bê ïzna

## AZAD ZELAL

Xweda nedikarîn ti zererî bidden ti kesî. Lâbelê ew, ne tiştê ku wê li menfaeta wan be, lê tiştê ku wê li zerera wan be dielimîn. Û ew bi xwe jî zanîbûn ku yên ku wan (cadûkeriyan) dikirîn, ti para wan ji axîretê tineye. Xwezî bizanîna ku tiştê ku dikirîn, çiqas li zerera wan e.

103-Heger evan îman bia-nîna û xwe biparêzîna, mu-kafata ku dê ji canibê Xweda bi wan hatibane dan, ji her tiştî çêtir bû. Xwezî bizanîna.

104-Ey kesên ku we îman anîye! Nebêjin "raîne" (: "me biçêrîne, bi me meyizêne"); bibêjin "unzurne" (: "çavê te li me be") û guh bidin. Ji kafiran re ezabeke elîm û derdnak heye.

105-Ji nav ehlîkitêb yên ku bûne kafir û müşrikan naxwazin ku ji canibê Reb ê we xêrek bi ser we de nazil bibe. Lâbelê Xweda rehmata

xwe bi kesê ku dixwaze tex-sîs dike (:rehmeta xwe bi ser wî kesî de nazil dike.) Xweda xwedyê fezleke mezin û muezem e.

106-Heta ku em jê çêtirî yan yeke şebîhî nedin, Em ti ayetî nesix nakin û nadîn jî-bîrkirin. Ma tu nizanî ku Xweda li her tiştî qadir e?

107-Aya ma tu nizanî ku Xweda malikê azmanan û zemîn e û ji bil Wî, ti xwedî û dostê we tineye?

108-Aya hun dixwazin weke ku (qewmê wî) Mûsa îmtîhan kiribûn, hun jî pe-yamberê xwe îmtîhan bikin? Kî dev ji îmanê biqere û kufrê tercîh bike, muheqeq ku ew weke wî kesî ye ku reya rast winda kiriye.

109-Gelek ji yên ehlîkitêb ji hesûdiya xwe, digel vê qasê ku heqîqet li wan eş-kere buye, dixwazin ku we piştî îmanê, vegefrînne kufrê. Heta ku Xweda ferманa xwe bişîne, wan efû bikin û dest li wan nedin. Muheqeq ku Xweda li her tiştî qadir e.

110-Nimêj bikin û zekatê bidin; her qencyia ku hun ji bona xwe teqdîm bikin, hun dê wê li cem Reb ê xwe peyda bikin. Xweda tiştê ku hun dîkin, dibîne.

111-Got in: "Ji bil Cihû û Fileyan ti kes nare bihiştê." Ev zenna wan e. Bibêje: "Heger hun rast dibêjin, naxwe ka delîla we?"

112-Erê; her kî bi îxlas berê xwe bidin Xweda û karê qenc û salihî bikin, muheqeq ku ecra van li cem Reb ê wan e û ne tirs heye ji wan re û ne jî wê mahzûn bibin.

113-Cihuyan got in: "Fileyan ne li ser ti esasî ne." Fileyan jî got in: "Cihuyan ne li ser ti esasî ne." Û ew kitêbê jî dixwînin. Yênu ku nezan bûn jî, van tiştan digotin. Dê Xweda roja qiyametê hukma tiştê ku li ser di ixtilafê de ne, bide.

114-Kî zalimtir e ji yênu ku dibin maniê wê ku navê Xweda di mizgeftên Wî de zikir bibe û dixebeitin ku wan mizgeftan xirabikin? Ewan dê nikaribin bêtirs têkevin nava wan (mizgeftan.) Nesîbê wan di dînyê de rezîltî ye û di axîretê de ezabeke mezin li benda wan e.

115- Rohilat jî ya Xweda ye û roava jî. Hun berê xwe bidine kîja alî, Xweda li wî alî ye. Xweda her alî girtiye û zana ye.

116- Got in: "Xweda ji xwe re kurek girt." Ew, ji vê yekê munezeh e. Ya esil ev e ku her tiştê ku di semawat û zemîn de ne, hemû ji Wî re fermanber in û yê Wî ne.

117- Wî azmanan û zemîn xuliqandiye. Wextê ku bix-

waze tiştek bibe, dibêje "Çêbibe!" û ew tiş, çêdibe.

118-Nezanan got in: "Çima Xweda bi me re jî naşte-xile, yan ji me re jî ayet na-yê?" Yênu berî wan jî, vê gotibûn. Dilê wan wek hev in. Me ji qewmê ku gehiştine yeqîniyê re ayetan qenc rewşen kiriye.

119-Muheqeq ku (ey Muhemmed) ji bona ku tu mizgînî bidî û bitirsînî, Me te bi heq (: Qur'an) şandiye. Tu ji ehlê cehenemê ne mesûl î.

120-Heta ku tu nekeve dînê wan û nebe ji wan, Ci-hû û File ji te razî nabin. Bibêje: "Hidayet ewe ku ji canibê Xweda hatiye." Heger piştî vî hemû ilmê ku jî te re hatiye tu bibî tabiê hewa û hewesên wan, dê ji te re ji canibê Xweda ne dostek he-be û ne arîkarek.

121-Yênu ku kitêba ku Me daye wan qenc û rast dixwînin, bi kitêbê qenc îman anî-ne. Û yênu ku pê dibin kafir, ew in ên ku di xesarê de ne.

122-Ey Benîsraîl! Nîmeta ku Min daye we û Min we (di hengamekî de) ji herkesî bilindtir kiriye, bînin bîra xwe.

123-Û ji wê rojê bitirsin ku ti kes bikêri kesê din na-yê, ji kesî berdêl qebûl nabe, şafaeta ti kesî neqebûl e û arîkariya ti kesî nagihê yê din.

124-Wextekî Reb ê wî, İbrahîm bi hinin kelfmeyan ceribandibû û ew, wan karan bi temamî anîbû cih. (Loma Xweda jî) got: "Muheqeq ku Ez dê te ji mirovan re bikime (rehber û) imam." (İbrahîm) got: "Ma zorokên min?" (Xweda) got: "Zalim nikarin jî ehda Min istîfade bikin."

125-Û Me Kabe ji mirovan re kire stargeh û emniyetgeh. Meqamî İbrahîm ji xwe re bikin nimêjgeh. Me li İbrahîm û İsmâîl ferman kir ku: "Mala Min ji tewafker, itikafker, rikûvan û sicûdvanan re paqij bikin."

## *Wê roj, bi ser me de derkevê!*

Ji brayê min ên ezîz re!

Sîreta Kek Sabah Kara pîrr baş e.

Ji tiştêneq re, dibêje "Erê!"

Ji tiştêneheq re dibêje, "Na!"

Hejmara sêyem a *Nabîbar* pîrr li xweşa min çû. Ez bawerim ku li xweşa gelê min jî çûye.

Xalîqê Alemê *Nabîbar*'e ji çixfîza heq dernexîne û Xwedê we serfiraz û serkeftî bike. Gelê me yê mazlûm jî, ji bîn destê zali-man xelas bike; amîn.

Wî wextî wê bîhar were û kulîlk vebin. Wê roj, bi ser me de derkevê. Bi ya Xwedê, zivistana reş jî li ser neyarêñ Xwedê be!

Belê, brayê min ên ezîz!

Ji tiştêneq re, "Na!"

Kek Sabah, mala te û mala xebatkarêñ *Nûbîbar*'e ava!

Ji sernivîsara te ez pîrr razî bûm, Xwedê jî ji te razî be!

Mahmut Çeliktepe

# EV ŞER, ŞEREKE HEZAR SALÎ YE

*Heger Boşnakan li Sirban wiha bikirana, ev dewletana  
ma wilo wê bê deng bimanana? Bê guman, na! Naxwe ev şer,  
şereke hezar salî ye. Ev, şerê Xaçyan e.*

Dewletên roava û Emerîka ti caran bi mislimanan û bi dînê İslâmê tehemul nekirin. Dînê İslâmê û yên ku mensûbên vî dînî ne, li ber xwe bi şiklê mani'ên ku ji wan nayê buhurandin, dîtin. Wext hat, erd û welatên mislimanan işxal kirin. Wext hat, ewil hînek însanên cahş ji xwe re kîrin kole. Paşê jî, wan ji mislimanan re serok tayin kirin. Wext hat, yên ku li hemberê işxala wan derketin, yan hatin kuştin, yan jî ketin zîndanan. Wext hat jî hemû mal û milkên mislimanan talan kirin. Û ji wan re çi lazim bûn, birin welatê xwe.

Durûtiya Emerîka û dewletên Ewrûpa li meydanê ye. Ji bo ku em vê durûtiyê bibînin jî, ti delîl ne hewce ne. Her tişt xuya ye û li ber çava ye. Kî çi nemerd e, kî çi derewîn e, kî çi zalim e bi hereketên xwe, xwe dide naskirin.

Îro çi kes bin, ew doh û pêr jî dîsa ew kes bûn. Her çawa be hinek caran bi maskan ve rûyê xwe veşartin û xwe bi meşîrîn nişan dan. Heta ku hi-

## SÜLEYMAN ÇEVİK

nek egitan ew maskeyên ser rûyê wan cirandin.

Derewan dikan. Carina dibêjin: "Em însanan ji zilm û zordariyê xelas dikan. Em bir-çiyân têr dikan. Em cilan li ta-ziyân dikan." Carina jî dibêjin: "Em aşitiyê tînin dînyayê û em mafêن însanan diparêzên." Hîna pirr tiştên ku li xweşa mi-rovan têr dibêjin. Di cihêkî de ko fêda wan hebe û ewciha ûrê wan hîna mezin bike, ew cih ji bo çerandin û xwedî bûna wan dibe erdek pîroz.

Ji bo dewletên emperyalist, hemû tişt pere û mefaet e. Çi ji wan re menfeet tîne, ew mu-qedes e. Wî wextî ji bo bi cih anîna wî tiştî, çi manî (:asten-ge) li hemberê wan hebin, li ber çavê wan xuya nabin. Ew maniyana heger mirov bin, di-kujin; mal û xanî bin, xiradikin; erd û dar bin, dişewitînin. Tiştî ji wan re fêde nayne jî, li cem wan pênc quruşbihaya wî tine ye.


Dewletên emperyalist, doza

xwînê dikan.

Ji mislimanan ti caran razî nebûn û nabin. Heta ku em xwe bi wan girênedin, wê ne-bin jî. Ev hezar sal in ku bi mislimanan re dijminetiyyê dikan. Ev hezar sal in ku jehra hundirê xwe li ser mislimanan vedirşin.

Kî dikare bibêjê hereketên Xaçyan (:Haçlılar) qediya ne? Îro lîstik û planêr emperyalîstan cûre cûre ne. Roj dibe, bi destê xwe zilmê dikan. Roj dibe jî, bi destên cahşikên xwe zilmê dikan. Lê wextê ku cahşikên wan nikaribin li ber ser-hildana mazlûman bisekinin jî, derhal bi xwe mudaxele dikan û dîsa her tiştî vedigerînin mîna berê; yanê mîna xwe û li gor qîma xwe dikan.

Li navenda Ewrûpayê, dewletên kafir, dewletek misliman naxwazin. Ji ber vê yekê jî, li zilm û sitemkariya li ser Bosna'yê re dengen xwe dernaxin. Mîna dewletên ji Yugoslavya'yê qetiyân û azad û serbixwe bûn, naxwazin misliman jî azad û serbixwe bin. Loma bi hezaran jin û keçen mislima-



nan dûçarı tecawuza Sirban di bin. Ne li Ewrûpayê tenê, naxwazin misliman li dinyayê ji bijin. Dixwazin misliman tim ji wan re kole û bindest bin. Dixwazin ku qerarêن (:biryar) di derheqê mislimanan de girtine, werin cih û xwestinê xwe yê gemarî li mislimanan bar bikin.

Dewletên Slovenya û Hirvatanstan û Makedonya, wextê ku serbixe bûn, ti kesî dengê xwe dernexist. Lê çawa dor hat mislimanan, agir û pilêtî bi wan ketin. Tew nehat bîra wan ku, xelqê Bosna'yê bi referandumê azadî û serxwebûn xwestibû. Ma van hovan li Cezayîr'ê ji partiya mislimanan ya ku di hilbijartînê de serketî bûbû, bi zorê ji îqtîdarê neanîn xwar?

Ji meha Adar a 1992'an virde Sirb, bi desteka dewletên File ve li ser Boşnak an wahşetê dîbarîn. Dewletên roava cenga Slovak û Hirvatan di mudetek kin de qedandin. Çima? Loma ku ev herdu xelq ji File bûn. Ji zilma Sirban re, çima ev bê dengî? Loma ku Boşnak misliman in. Ji Bosna re kerr û lal dimînin. Ev deh meh e, hî-

na ji vî şerî re ti çare neanîn. Hinek qerarên sembolik bi wasîta Nete-weyêن Yekbûyî (:Birleşmiş Milletler) digrin, ew ji tev vala û pûç in û hêsrêن cavan tew kêm nakin.

Heger Boşnak li Sirban wiha bikiranâ, ev dewletana ma wilo wê bê deng bimana? Bê guman, na! Naxwe ev şer, şereke hezar salî ye. Ev, şerê Xaçiyân e.

Mîsalê durûtî yên roava, pirr in û naqedin.

Ew bixwe tiştekî bikin, xweş dibînin. Wextê ew tişa li wan bibe, ti carî tehemul na-kin. Mirovan direvînin, diku-jin û teyaran ji hewa tînin xwarê. Bajaran bombe dikin, însanîn sivîl dikujin.

Çima ku Libya çend caran qerarên Amerika neanî cih, ev cend car e ku bombaran dibe. İsrail bi alikariya Amerika di navenda dewletên İslâmî de mîna girêkî çik bûye. Bixwe li ser Filistîniyan bombe-yan dîbarîne û zar û zêçekan bombaran di-ke. Lê wextê ku yek leşkerê İsrailî tê kuştin, dinyayê radike ser piyan.

Kes nikare bibêje ku Iraq dewleteke baş e. Lîbelê dewletên roava û Amerika ji bo ku li ser Iraqê bomban bireşîn, li behaneyen digerin. Hebbe dikin qubbe û ne xwîna Sed-dam, xwîna mazlûman dirjînin.

Pirr kes pirs dikin û dibêjin: "Dewletên

misliman ci dikin?" Bi rastî dewletên misliman, ne tiştekî dikin û ne ji tiştekî ji vê zêdetir dikarin bikin. Lewra ji dewra ku li ser mislimanan mîtingehî (:sömürgecilik) tetbiq bûye, mislimanan pergala xwe şaş kirine. Ti cara nahêlin ku misliman ji vê şâşitîyê derkevin û hişyar bin. Lewra wextê misliman hişyar bin, li van erdan wê hakîmiyeta zaliman ji bîqede.

Kesênu ku iro serokê dewletên mislimana ne tev ji Amerika û roava re kole ne. Di bin bandûra mezinê xwe de, bê destûra wan nikarin ti qerarekî bistînin. Lewra bi sayeta efendiyê xwe hene û serpa ne.

Ji dewra Osmanî ve kelehek İslâmî li Ewrûpayê mabû. Iro ji bo ku Boşnak misliman in, bi desteka dewletên roava mal û warê wan wîran dikin. Zar û zêçen wan tevî pîremîr û pîrejinan dikujin. Tecawuzê li jin û keçen misliman dikin.

Mora İslâmî ji Bosna'yê dikolin.

Hemû kes bê deng in.

Hemû kes kerr û lal in.

Wextê hişyarbûnê ye, ji vê xewa xefletê.

## *Bi rastî, kovara Nûbihar kîmasyek mezin tijî kir*

Xebatkarên hêja

Ji bo vê xebata we ya birûmet û gi-ranbiha ez we pirr pîroz dikim.

Bî rastî, kovara Nûbihar kîmasyek mezin tijî kir.

Devokê me Dimilkî ye. Ji bo viya em dixwazin hûn rûpelkê ji devokê Dimilkî biweşînin.

Ji Xweda daxwaziya min, serefraziya we ye. Xweda yê mezin, xebate we de alîkarê we be.

**Sedat Mirseydan**


# DURÛTIYA ROAVA: ASPIRÎNA SOMALÎ BI XWÎNA BOSNA BI ME DIDIN XWARIN

*Vê demê li pêsiya misilmanan şewatekî dehşetkar heye. Pilêtên vî agirî erşa ala dilerzîne. Di vê şewatê de mazlûm dişewitin, dînê İslâmê dişewite, zar û zêç, keç û xort, bûkê ser bi xêlî û zavayê dest bi hine, dişewitin. Ji bona van mazlûman lazime em bi mal û canê xwe ve têkoşîn bikin.*

**G**ehîstina însan di dinyâye de, weke zarokan ku teze dest bi tehsîla xwe bîke ye. Yanê berê dibistan, pişt re dibistana navîn, lîse û dawîn de jî zanîngeh... Bi awakî din, çaxa ewîl de însan di mixara de û weke hovan dijiyan. Çaxa navîn de, hinek kedî bûn û hatin deşte. Çaxa nû de bi wasita teknolojiyê, sir û qanûnê şerîta kewnî kifş kirin. Gelo di vê pêşveçûnê de însan weke pelê liber bayê ne ku ba bi kijan alî de bê û wê pel jî bî wî alî de herin? Yan bi alîkariya Xwedê û Qasidê Wi ve însan ber bi gehîştinê de çû. Dîrok şahîde ku însan çiqas di rîya sirata musteqîm de, yanê di rîya Quranê de çûbe, ewqas derketîye silameitiyê. Çiqas ji dîn û heqiyê dûr ketibe jî, hovîtiya însan ewqas derketîye meydanê. Weke halê însanê vê esrê... Van însanan çiqas bi eşkeratî şarazebin jî, dervê wan bivaje hundîrê wan û hundîrê wan derkeve derveyê wan, ewê bikevin dirûvê mar û sa û beraz û rovî û keftaran.

## N. EBDILAH Û QISQANÎ

Yanê van însanan bi şikl û sîmayê xwe ve însan in. Lîbelê bi kirinê xwe, ji heywanan zêdetir heywantiyê dîkin. Ji bona vê yekê Xweda yê qehar û cebar dibêje kû: "Ko hun ji zaliman dûr nekevin, wê agir we mesix bike û bişewitîne."



Belê ev ayeta kerîme, misilmanan û alîkarê heqiyê muxatab digre. Vê demê li pêsiya misilmanan şewatekî dehşetkar heye. Pilêtên vî agirî erşa ala dilerzîne. Di vê şewatê de mazlûm dişewitin, dînê İslâmê dişewite, zar û zêç, keç û xort, bûkê ser bi xêlî û zavayê dest bi hine, dişewitin. Ji bona van mazlûman lazime em bi mal û canê xwe ve

têkoşîn bikin. Ev xebata me çiqas li xweşa farmason û munafîqan neçe jî, qîmeta wê tineye. Di serê vê şewatê de jî Bosna têt. Biqasî nifusê Kuveytê gişî, miletê Bosnayê koç kirine. Bi hezaran xanî hatine hilşandin. Gelo wan humanîstên ku bi havara hutan diçin û milyonan xerc dîkin, iro li kûderê ne. Him jî ev qêrin û zafrin, ne li Efxanîstanê, ne li Kurdistanê û ne jî li Filistînê ne. Di navenda Ewrûpayê de ne. Gelo van hovana wê çawa vê rûpela reş ji pirtûka dîrokê hilşin? Gelo ew wê çawa van qetîşaman bi zarokên İslâmê bidin jibîrkirin? Ji bona menfaeta Emerîka û Roava ew hemû dikarin tekîle Iraçê û Somalî bibin. Di tekîla Iraçê ya dawîn de 110 teyarê Emerîka, 6 teyarê Fransa û 5 teyarê İngilistan di Delava Besrayê de hebûn.

Van însanê durûyî yêner cerdiker û xayîn, jî bona petrolê dikarin ji Emerîka bi rê bikevin û werin Delava Besrayê. Ko petrola Bosnayê hebûna, wê tekî-

latiya wê jî hebûna. Ji bona kutineye, keştiyên (:gemi) Emerika û Ingiliz yên herbê Behra Adriyatikê de li qetlüama Bosnayê temaşa dikin û nahêlin misilman jî alikariya birayên xwe bikin. Pêvistîya van emperyalîstan jî embargo ye. Gereke neyê jibîrkirin ku beriya hilşandina Yugoslavyayê de, di roava de qeweta sêyem Yugoslavia bû. Íro embargo dane ser erdê Yugoslavia ya berê. Yanî ji xwînxwarê Miloseviç re dibejin; "Vaye me destê wan li kelepçê û lingên wan li qeydê xistiye, de ka tu jî bikuje!"

Bosna di agir de dişewite. Lê ka Alema İslâmê ci dike? Qetıştekî jî nikare bike. Lewra wextê ku mirov teqlîda yekî bike, nikare ji wî mirovî bi pêşdetir here. Serokênu ku aniha li ser

xwîn û hêşirê mislimanan text û payê xwe vegirtine, tev zarokên Emerîka û roava ne. Misliman bi navê Jonî û Tonî û Cak nehatin xapandîn. Roava bi navê Mistefa, Hafiz û Husnî Mubarek ve mislimanan rihet xapandin. Anîha navê qumandarê leşkerê Neteweyên Yekbûyî (:Birleşmiş Milletler) yê li Bosnayê, Tariq e. Bi van navan em xapandise.

Gereke misliman bizanibin ku, Xwedê ferman kirîye: "Cihû û Fileyan ji xwe re nekin heval" û "Hetanî ku hun dînê xwe ne-guherin, kafir ji we hez nakin." Serokê misliman ên munafiq, guh nadin van ayetan û ji kafiran hevîdarîyê dikin. Di medya û televizyonên xwe de dibêjin ku, "Ji bona şehîdên Bosnayê 100 hezar xitm hatin xwendin." Baş e! Xitmên Quranê bila bêñ

xwendin; lê xitmên dayina sîlahan jî gereke neyên ihmalkirin. Dema mirov li hemberê keftaran xwe zelîl bide nîşandayîn, wê keftar kirêya pênce û diranê xwe jî bi xwazin. Çawa ev ji esrekî (qirnek) zêdetir e mislimanan cihadê berdan, di aqîbetê de hirç û rovî û keftarê emperyalîstan, goştê laşê me jî xwarin. Çima idî hişyar nabin misliman? Kafirên roava û munafîqên rohilat hetanî kengî ewê xwîna me bimêjin? Ma qey bes nîne?

Rehmeta Xwedê li ser şehîdê İslâmê be!

Şifa Xwedê li ser birîndarê Bosnayê be!

Qehra Xwedê li ser xwînxwarê Miloseviç û alîkarân wî be!

Ü Xwedê sebr û tehêmûl û hişyarbûnê bike nesîbê me mislimanan!

## Pîrozname

Ji Karkir û Nivîskarên  
Kovara NÜBIHAR'ê re

Hevalên hêja!

Ez berî sersalê bi çend rojan çav bi Nûbiharê ketim. Pêşî mamostê nemir Ehmedê Xanî hate bîra min û ez lê sêwirîm, ramiyam...

Lewra Ehmedê Xanî di paşıya Nûbihara xwe de gotiye: "ev reng e dibêjît Xanî, eger tu bi fî'an î, bifikre..."

Nûbihar, ji 1683'an ve ye ku derketibû. Lê ev demeke dirêj e wê dabûne razandin. Îcar niha Nûbihar şîyar bû û mîzgîniyeke xweş ji İlhamî Ehmedê Xanî bo me anî. Nûbiharê, Xanî ji gorê rakir, jîyanê û rewşena binahiya Kurdan rewşentir kir. Xeysetê kovara Nûbihar yê herî girîng ku bala her kurdekkî dikişîne, ev e ku xwerû bi zimanê Ehmedê xanî derdikeve!

Berî her tîstî ez hemû karkir, nivîskar, alîkar û emekdarên Nûbiharê pîroz dikim. Hêvîdar im hûn di kar û işen xwe de serkeşti bin. Bê bela û siqûmat Nûbiharê bidin jiyanîn.

Bi şadiya azadî û serfiraziyê, di xweşiyê de bin.

Zeynelabidîn Zinar

## Ronahiya we min jî ronak kir. Min riya xwe nas kir

Pêşî selâm, rehmet û bereket a Allah Teala (c.c.) li ser we û me be.

Piştî vana, hêvî dikim jî Allah Teala ku me û we û gelê me her dem dîlfîreh bike. Ji zîlmên zaliman, ji şerî xayinan û munafîqan û ji fitna fasiqan muhafexe bike. Ji ruyê insanên di nav me de ku neqenc in, me nedê azabê. Çawa seyda Bedîuzeman dua dike, em jî di her duayén xwe de dibêjin, "Ya Rab tu halê alemê îslah bikî. Ehlê dînyayê îslah bikî. Wan serokênu ku li ser serîn mislimanan in tu îslah bikî û ji haq û edaletê neqetînî. Amîn."

Kovara Nûbihar li ser xêrê be. Hejmara "Nazanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye!" min zehf këfxwes û dîlfîreh kir. Ronahiya we min jî ronak kir. Min riya xwe nas kir.

Min kovar a Nûbihar da melayê gundê me. Bi hevalên bixîret û haqperist re didim naskirin û xwendin.

Hêviyek min ji we heye: Ko şîve û xwendina gelê me yek bibe baş e. Bila di kovarê de hewadis û nivîsandinê xwendevanan hebin.

Ev hêviya min ji ber gelê gundê me de ye.

Selam û rehmata Allah Teala li ser me û we be. Amîn.

Hîvxan Sozdar

# BARÊ ÇAXEKÎ LI SER MILÊ DAYIKAN

*Cih ko hat, Xedîce ye,  
di rojênderd û zehmetê de  
palpişta mîrê xwe ye.  
Ew jin e, ku mûmina  
ewil, ew e!*

**D**inya me di nav qilêr û jengê de maye. Serzemîn gemar kirine bi xwîn û cendek û bombeyan.

Azman gemar kirine bi fixan û mersiyeyên mazlûman.

Civik nema azadiyê dixwînin li ser darên kesk û di nav gulan.

Hişk bûn, wêran bûn, tarûmar bûn bexçê me.

Qaj ketine dewsa bilbilan; neazadiyê dixwînin û dibêjin bi serbestî û azadane.

Lêbelê hêstirê mazlûm û musted'efan wê bibin ava jînê, ji van darê hişk re; wê bibin kaniya ava heyatê, ji qilêriya azman û serzemîn re.

“Çi li we hatiye ku hun şer nakin di riya Xwedê de û ji bona lawik û pîrek û zarokên ku dibêjin: “Ya Reb, me ji vî diyarê zaliman derxîne; ji cem xwe arîkarek bişîne ji me re, ji cem xwe xelaskarek bişîne.” (Sûreta Nîsa, 75)

Ev tabloya ku di Qur'an a Mecîd de hatiye resimkirin, ji vî zemanî re, ji iro re û heta roja qiyametê, ji hemû zema-

## MİHRİCAN DOĞAN

nan re carî û serpa ye.

Xwedê Rebbê musted'ef û mazlûma ye û ev zilm encaq wê bi destê mûminan ji holê rabe. Lêbelê xelasiya mirovan, bi xelasiya jînê ve girêdayî ye. Lewra jin, diya musted'efa û hemû mirova ye.

Lê malesef iro halê jînê, halake pirr derdnak e. Ji destê bavê xwe digrî, ji destê diya xwe digrî, ji destê birayê xwe digrî, ji destê mîrê xwe digrî û ji destê zarokê xwe digrî. Lêbelê li ser vî halî jî, ya ku di merhala ewil de mesaja şehîdan dîghîne xelqê jî jin e.

Cih ko hat, Zeyneb e, piştî şehadeta Huseyn, mesaja wî û heqîqetê bi qîr û feryadan li ruwê Yezid dixe.

Cih ko hat, Faşîme ye, diya bavê xwe ye!

Cih ko hat, Xedîce ye, di rojênderd û zehmetê de palpişta mîrê xwe ye. Ew jin e, ku mûmina ewil, ew e!

Cih ko hat, Sumeye ye, ku şehîda ewil ew e. Şehîda pêşî,

ew e!

Cih ko hat, Asiye ye, di nav avzêla genî ya Fir'ewnî de mîna gulekê gehîştiye. Ko jina Fir'ewn ji be, umêdê musted'efan Mûsa di hemêza wê de mezin buye!

Cih ko hat, Meryem e, di nav gelê xwe de sembola heya û ifet e. Diya Mesîh, ew e!

Cih ko hat, Hacer e, bi serê xwe ve û bi tenê riya têkoşînê dipê. Di nav Sefa û Merwe de dibeze, da ku riya xelasiyê peyda bike.

Cih ko hat, çarşefa wê, ala mazlûman û nîşana şîn a musted'efan e.

Ew e ya ku çekan dide destê mîr û kurêñ xwe û wan bi ser zilmê de dişîne, da ku zilmê ji holê rakin.

Ew e ya ku di riya sergûn û nefiyê de zarok li pişt, ji destê zarokan girtî, birçî û pêxas, ji çiyan, ji newalan, ji riyê herî, di bin berfê yan baranê de dimeşe û ji zilmê re bi her halê xwe ve dibeje “Na!”

Jin e ew, barê vî çaxî û çaxan li mil e!

# NAMEYÊN BÊCEWAB / 4

## 26 Çileya Paşîn 1991

Berf barî doh, bajar hê li ser piyê xwe ye  
Ji holê ranebûn bloqên beton  
Dê îsal jî bi şirûba kuxukê bibuhure zivistan  
Her tişt di cihê xwe de ne, weke ku tu zanî

Ez bi nenivisandina te aşîna me, îhtiyac jî tineye him  
Ez ne li benda cewab im, besî min e ko ez te bibihîsim  
Binvîs nenvîs ne muhîm e, lewra ez dê çi bikim bikim  
Rokê ez dê rengan bibihîsim û dengan bibînim

Em bi ro herbê dixwin, bi şev herbê dixwin li vir  
Em Iraqê xerc dikin, qurûş qurûş bi hev re  
Berx bûne şirîkê gur, sifre tişe goştê nû  
Dê dora me çi wext bê, ti kes nizane li vir

Berf barî doh, min digo, dê tiştin bibedilin  
Min digo, dê ji holê rabin bloqên beton, dê ji holê rabin riyê ku merev  
bi ti derê ve nabîn  
Berf di binê lingan de çû  
Spî bekareta xwe ji dest da, êdî rê, ji berê qirêjtir in

Ez tiştekî nakim, ji bil ji te re nivisandin, ez rawest im  
Dibe ku sibe ne weke îro ne weke doh be  
Dibe ku sibehê em di jiyanekî nû de çavê xwe vekin  
Tu nizanî ku ci kokê hişk dibuhurin ji qirîka min, vê zivistanê, vê şevê,  
vê hengamê

Ez temennî dikim ku tu ne di vî halî de bî  
Yêñ mezin ji çavê te diramêsin, yêñ biçûk ji destê te  
Ez nabêjim ku ez li benda cewabê acil im  
Ji te re nivisandin, besî min e, pê germ dibe dilê min

## Sabah Kara

# LÊPIRSÎNA “PIRSGIRÊKA KURDAN”

Me bi nêta tesbîtkirin û  
weşandina ray, raman û pêşniyarên  
sazûmanan û zana û rewşenbîran di heqê  
“Pirsgirêka Kurdan” de lêpirsînek rêk xistiye. Em  
ê di vê hejmara xwe de bersivên du rewşenbîrên hêja;  
Mîrza **Osman Tunç** (Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran ê  
kovara **Yeni Zemin**) û Mîrza **Mehmet Metiner** (Berpirsi-  
yarê Giştî yê kovara **Yeni Zemin**), biweşînin. Ji ber ku  
Osman Tunç û Mehmet Metiner bi heddê kafî bi Kurdî ni-  
zanin, bersivên xwe bi Tirkî rêkirin. Bersiva Osman Tunç,  
ji terefê Mîrza **Bedran Ezeban**; û bersiva Mehmet  
Metiner, ji terefê Mîrza **Naci Gülmez**  
ji Tirkî hatin wergerandin bi Kurdî.  
Dê lêpirsîna me di hejmarê  
me yên hatî de jî dom  
bike înşelah.

## PIRSIYARÊN LÊPIRSÎNA ME:

- 1- Ray û ramana te di heqê “Pirsgirêka Kurdan” de çi ye?
- 2- Ji bona hel û fesilkirina vê pirsgirêkê pêşniyarên te çi ne?

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran ê  
kovara ‘Yeni Zemin’ OSMAN TUNÇ:

“BERÎ HER TIŞTÎ, EV  
ZORDESTIYA QEDEXEKIRIN A  
LI SER ZIMANÊ KURDÎ GEREKE  
JI HOLÊ RABE. DIVÊ KURD DI  
MEKTEB Û NAVÊNDAN DE BI  
ZIMANÊ XWE TALÎM Û  
AMOJKARIYÊ BIKIN”


1) Pirsgirêka Kurdan berî her tiştî pirs-girêkeke netewî ye. Pirsgirêka huwiyyeta miletékî ye. Kurd ji mêj ve têkoşinê didin, da ku xwe bidine qebûlkirin. Digel vê qasê ku tarîxa vê têkoşinê pirr kevn e, lê bi mana gelparêziya modern, ji dewra ku gelparêziya nû hatiye rojevê û pê de hereketa netewiya Kurdan zûkahiyek qezenc kiriye. Meselen; di dewra împeretoriyeke pirnetew (a Osmanî) de, Pirsgirêka Kurdan bi rewşa ‘pirsgirêka netewî’ nikarîbû were holê. Loma em dikarin bibêjin ku; ev pirsgirêk, piştî ku dewletên netewî di minitiqê de hatin avakirin derketiye holê.

Xususeke din jî heye, divê ev jî li ser

heye, divê ev jî li ser van se-beban were jimartin. Ew jî ev e ku, piştî Cenga Cihanî ya Yekem Kurdistan di nav pênc dewletan de parve bûye û ev parvebûn jî rewşen din li vê pirsê zêde kiriye. Bi vî awa-yî hududê têkoşîna ku ji bo Kurdistan, yan ji bo gelê

Kurd tê dayin hê jî fireh bûye. Heger em kurt bibirin, em karin bibêjin ku ‘Pirsgirêka Kurdan’ di çarçiva teng de pirseke netewî ye. Pirsgirêka tayinkirina qede-ra miletékî ye. Lîbelê wextê ku em li vê pirsgirêkê ji cîhetâ tarîx, çand û yekitiya dî-nî mîzegin, ji bo ku ev pirsgirêk di coxrafya islamê de ye, pirseke umetî ye jî. Û bi manake firehtir jî, pirsgirêka însaniyetê ye.

2) Çareserkirina pirsgirêkê, piştî teşxîse-ke bi isabet têt. Heger em di teşxîsê de şaşîtiyê bikin, em nikarin ji bo çareserkirina pirsgirêkê gavêne serefrazane bavêjin. Ji vê cîhetê, bersiva pirsiyara ewil, teşxîsa ‘Pirsgirêka Kurdan’



teşkîl dike.

Ji bo çareserkirina vê pirs-girêkê, gav û qedema ewil, qebûl û naskirina huwyet û navnasiya Kurdan e. Helbetê ev qebûl û naskirin gereke naskirineke bimuhtewa û ti-jî be. Lewra malûm e ku naskirineke şıklî û xalî ji muhtewa, ji sedir re şîfa nabe û ti-tiştî hel nake.

Qebûl û naskirina navnasiya Kurdan, hinek mua-melên ku divê çêbin û me-sûliyetên ku divê bêñ cih jî bi xwe re fîne. Di merhala ewil de gereke meseleyên ku navnasiya netew tînin meydanê her ci bin, ew hemû deynin meydanê û biversivînin. Bi baweriya min, ji vana tiştîn ku di gava ewil de ne jî, mafêñ ziman û çandî ne. Berî her tiştî ev zordestiya qedexekirin a li ser zimanê Kur-dî gereke ji holê rabe. Lazime serbestiya zimanê Kurdî we-re cih. Yanê gereke Kurd bi serbestî bikaribin bi zimanê xwe bi peyiyin û binivîsin. Noqta duyem jî ev e ku, ji bo ifade kirina çanda Kur-dan û şiklê ifadekirina vê çandê, mîna tarîx, edebiyat, muzîk û folklorâ xwe, lazime zemîneke azadane werê holê. Yanê divê ev zemîn ji Kurdan re tamîn bibe. Dîsa nolî van mafêñ çandî û ji bona pêkanîna van mafan, gereke karibin ji televizyon û radyoyê jî iştîfade bikin. Divê Kurd di mekteb û navêndan de bi zimanê xwe talim û amojkariyê bikin.

Qebûlkirin û nasîna hu-wiyet û navnasiya çandî ya Kurdan, divê bi van unsurên ku me jimartine ti-jî bin.

**Osman Tunç**  
*Ji Tirkî: Bedran Ezeban*

## Xweda we ji şerê zaliman, munafîqan û cehsan biparêze!

Selat û selama Xweda li ser we be.

Bi vê kovara Nûbiharê û çapkirina we ya pirtuka Pe-yîvén Piçûk û Peyîva Bîst û Seyemîn, ez pîr dilxwes û kêfxwes bûm; weke ku we dinya min ava kir.

We ez pîr hêvidar kirim. Xweda û Qasid (Pêxember selat û selama Xweda li ser be) ji we razî bin. Ev xizmet, xizmeteke pîr mezîn e û Xweda hîn mezîn bike. Ev xizmetan weke dendika ne. Ko we ev dendikan çand û di bin axê de riziyan, dûre (:paşê) pelk, çilo û êmîşan ê bide însaelah. Xweda we ji şerê zaliman, munafîqan û cehsan biparêze.

Ji we hemû personelên Nûbiharê re pîr spas dikim û Xweda we û miletê we yê mazlûm biparêze.

Xweda kesê bêkesa ye.

**Mustafa Yıldız**

## Hîna nûh eqlê me têt serê me û em hişyar dibin

Geli xebatkarên kovara Nûbihar!

Selama Xweda yê hemû aleman li ser ve û hemû mislimanan be! Ez vê nameya xwe ji bajarê Ruha dinivîsinim. Di van rojan de em Hz. İbrahim Xelîl yad û şad dikin. Behsa İbrahim Xelîl de he-valek got ku: "Kalo İbrahim Xelîl gelek pût û senemên Nemrû-diyan şikand." Li ser vê peyvê hun civata kovara Nûbiharê ha-tin bîra min. We jî bi vê kovara Nûbiharê gelek pût û seneman şikand. Berî vê demê bi zimanê Kurdî ti kes tiştî nedînivîsand. Li ser vê xebata we êdi gelek Kurd bi zimanê xwe dinivîsin û dix-wînîn.

Tiştîk tête bîra min, lêbelê ez nizanim li wî tiştî ez bigrim, an ez bikenim. Berî çend salan ez çûbûm leşkeriya Tîrkan bikim. Di-ya min û bavê min hindik jî Tîrkî nizanîn. Min hemû nameyên xwe bi zimanê Tîrkî dinivîsand. Ew tiştî ji min re anîha gelekî xerîb têt. Ma min çira bi zimanê xwe û bi zimanê dê û bavê xwe nedînivîsand? Ez viya jî bibêjim: Wellah ew şuxlê min, ne ji tîrsê bû. Hema em wisa hov bûbûn. Em wisa sersem bûbûn, an jî em wi-sa sersem kiribûn. Hîna nûh eqlê me têt serê me û em hişyar di-bin. Wextê ku em hişyar bûn me dît ku zimanê me ji me standî-ne. Hele bisekinin em hebikekî din çavê xwe vekin û bigerînin, em dê hîn gelek tiştîn xwe bibînîn ku van zaliman ji me bi zordestiyê standine û talan kirine. Ma kanî dînê me? Ma kanî dsro-ka me? Gelo kanî kiras û xiftana diya me? Ma kanî şal û şapikê bavê me? Ma kanî welatê me û heft sed bavê me? Ma gelo kanî şeref û qehremaniya gelê me? Erê ew tiştîn hanê hemû berê li cem me bûn; lê anîha ji van tiştan yek jî temam tîne ye, belku cih û warê van heye.

Xweda bi destûra xwe ve ew tiştîn hanê daye me; naxwe la-zime em van tiştîn xwe hemûyan bigrim û biparêzin. Em ê van zalimên berê teslimî Xweda û roja mezîn bikin û van zalimên anîha ji bi destîn xwe qehr bikin.

**Mehmet EMİN**

## Berpirsîyarê Giştî yê kovara ‘Yeni Zemin’ MEHMET METİNER:

“JI BONA KU EV PIRSGIRÊK  
HEL BIBE, DI MERHALA EWIL  
DE GEREKE BI ZUYÎ DI  
TIRKIYÊ DE ZEMÎNEKE  
NÛDEM, DEMOKRATÎK Û  
HUQÛQÎ PÊK WERE”

1) Pirsgirêka Kurdan, ne pirsgirêkeke mintiqeyî û herêmî ye; pirsgirêkeke netewî ye.

Piştî Cenga Cihanî ya Yekem, parvekirin û pênc parcekirina Kurdan û vale derketina wadeyên dan a heqên wan, bû sedema wê ku hêdî hêdî tevgera netewî ya Kurd dest bavêjê çekan û dest bi têkoşîna çekî bikê.

Piştî van buyêrên ku di mintiqê de dewletên nijadperist anîn holê û ev dewletan maf û azadiyê însanî yê Kurdan bi wan nedan û wan men û înakir kirin, Kurd jî di mintiqê de weke “pirsgirêkê” der hat in. Yanê gelê Kurd jî xwestiye ku ew jî weke gelên din xwedyê maf û îmkanan be û ji ber vê yekê ev pirsgirêk hatiye holê. Di vê çarçivê de Pirsgirêka Kurdan, tête mana xwestina mafên netewî yê

Kurdan. Yanê mana vê pirsgirêkê ev e ku Kurd, mafên xwe yên netewî dixwazin.

2) Ji ber ku dewletên netewî vê pirsgirêkê anîne holê, loma ji bona ku ev pirsgirêk ji holê rabe, ji dêvla dewletên netewî û nijadperistên ku mafên neteweyên din û

kar û men dikin, gereke di mintiqê de dewletên ku ji piir neteweyan teşkil bûne û li ser bingehêke huqûqî hatine sazkirin, werin meydanê. Di vê manê de cemiyeta Osmanî tev cemiyeteke mozayîkî ye. Yanê dewleta Osmanî li ser bingeha netewî Nehatiye avakirin. Bi awake din, hemêza cemiyeta Osmanî, bi xoşdîtinî û bi fikra umetê, ji hemû netew û dîn û mezheban re vekiri bû. (Lêbelê wextê ku em vê tesbîtê dikin, em vê yeke jibîr nakin ku, piştî ku dewleta Osmanî sewq bi alî xerbê de bû û di vê dewletê de jî hukûmet û sîstemeke merkeziyetvan û brokratîk a moderin hate holê, xebatin pêk hatin ku vê mozayîkê ji hev parve kirin.)

Piştî van gotina; ez çare û hella vê pirsgirêkê di lihev hatina dîn û irqan û wek-



hevîti û xoşdîtinê û komela umetê de dibînim. Ez li ser vê yekê disekinim ku gereke sîstemeke civakî were holê ku hemû netew û nijad giştî bikaribin bi navnasiya xwe ve, hebûna xwe biza-nibin û çanda xwe di zemî-neke azadane de bi pêş de bibin. Ez dixwazim bibêjim ku hemû ev pirsgirêk, dê di sîstemeke ku ne asîmîlas-yonvan û înkârvan û nijad-perist e û hemû milet dê bi-karibin li ser bingeha wek-hevî û ji dil û bi xwest pevre bin de dê temamen û ji kokê hel bibin. Bi baweriya min, riya ku dê me hemu-yan bîne cem hev û qewet û mane bide pevrebûna me jî ev e.

Gelo lazim e ku ez bibêjim ku ez behsa wê fêhim û xebata ku Bîlal ê Hebeşî û Selman ê Farisî û Omer ê Erebî aniye cem hev û wan kiriye bira, dikim?

Ez vê jî dixwazim bibêjim ku di Tirkiyê de hella vê pirsgirêkê di merhela ewil de bi demokrasiyeke tam û mukemel de dê pêk were. Ez ji dil bawerim ku ev pirsgirêk di sîstemeke huqûqî ku ne qedexevan e û li cemiyetê îdeolojiyeke resmî bar nake de, dê hel bibe.

Ev pirsgirêk bi zordes-tiyê hal nabe; dê bi aşitiyê hel bibe. Lêbelê ji bona ku ev pirsgirêk hel bibe, di merhala ewil de gereke bi zuyî di Tirkiyê de zemîneke nûdem, demokratik û hu-qûqî pêk were.

**Mehmet Metiner  
Ji Tirkî: Naci Gülmез**

## *Mala Xweda ava ji nuha pê de em ne bêdeng in û kovarek me jî heye*

Selama Xweda li ser hewe.

Mala Xweda ava ji nuha pê de em ne bê deng in û kovarek me jî heye.

Min helbesteke Necip Fazıl a bi navê "Şarkımız" vegerand zmanê Kurdi bi navê "serana me". Di kovara *Nûbihar* de ev wergêra min bi navê "Heyat Meyat" hate weşandin. Ji bona vê yekê jî, ez spas dikim û berdewama *Nûbihar* ji Xweda dixwazim.

Ez dixwazim ku ev helbest jî bê weşandin. Bi destûra Xweda ez ê nameyin din jî bişnîm.

### STRANA ME

Ko bişkin temamê diranan rojekê / Wê biesq bizîvire dolaba me / Ji ezman destek çavê şîl paqîjê / Wê keyf bikeve mal û mewdانا me

Wê kaş winda bibin em ê derkevin rastê / Em ê bigihêjin roja bê nihayetê / Li ber kevirê qewsika, fişeng e / Ferqa me û aleмê

Wê azad bibe zman, dîrok, exlaq û îman / Wê bibînin çawa ye, ci ye mîranîn / Wextê erd û ezman bêjin em av nadîn / Wê her bexçeyî av bide coya me

Em ê herin di rîcîka ronî de em ê herin / Kevir di dil de, av li kabokê em ê herin / Rojek ê bibe êvar em ê jî herin / Wê bi-mîne di lêvan de strana me

**Necip Fazıl Kısakürek  
Werger: Mehmed Diyaeddin Dağhan**

## *Rexne*

Hemd û senayê bê eded / Ji bo Yezdan ê ehed / Selam û selewatan hemî / Li ser Resûl ê me yê umî / Ger al û eshab û tabîn / Ku li ser rîsaleta wî herkes mutmeñ / Min dixwest iro kovarek Kurdi / Buha pirr û lîsanê gundi / Ewran girankir li ser Stanbol / Derket Nûbiharek rexne dil / Derdêne te ci ye dirêj me ke tu / Birînen te ci ye qiset bike zû / Çend gotinên we rexnekim / Rastiyan li we beyankim / Meqsed ne ji bo dijmintî / Belkit uxuwet û birañ / Nîne cañz destpêk û mange / Heya hebe fatîle û begere / Pa ev ciye Yezdan ê dilovan / Ma qey qedaye sifatit Yezdan / Hedîs û ayetan tefsîrkin ji Erebî / Ger hun bizanîn serf û nahwî / Cih bidin kilasîken Kurdi / Mîna Mela û Feqî û Xanî / Serdarê zmîn qebûlkin Xelîl Xeyâli / Xwe da dû wî Celadet Bedirxanî / Biweşînin nivisarêt Hemze yê Mûksê / Li pê wî Ebdurehman ê Nursê / Li dor masê cêmekin bêje / Hun daim rexnebibin bi dilkî tije / Ev ci ye jiyanname hedîsname / Heya ku bajo ev bêjê ê bê mane / Min zaf dirêjkir efû dixwazim / Selam ê Xweda yê ehed / Daim li ser we be bê eded

**Fehmi GÜR**

# SEDEMA “PIRSGIRÊKA KURDAN” EMERÎKA Û REJÎMÊN DÛVIK IN

*Divê em misliman pêşîya pêşîn ji nav pence û lepêñ rejimên li me pelikîne bixelisin. Yanê ji van sazûmanêñ qeşmer û leyistokêñ derivehî (:biyanî) rizgar bin. Pirsgireka Kurdan û hemû mafxwazan bi qilobandin û qewitandina van rejîman, çareser dibe.*

**B**erî her tiştî ez dixwazim ku bidim zanîn û belşikirin ku em mislimanin û em dê her wisa bîmînin. Ji ber vê nûqtê, hemd û spasa bêpayan û bêjimar ji Xwedê re be...

Geli brano!

Pirsgireka Kurdan, ne pirs-girêkeke nûh û hemdem e. Ev pirsgirek, şax û dirêjiya têkoşîna heq û batîl a dîrokî ye. Her tim û her dem li ser vî erdê Xwedê, xwîna mirovan weke avêñ çema hatiye rijandin. Dîroka mirovatiyê, weke ku bi xwînê hatibe nivîsandin. Rûpelên dîroka mirovatiyê dema tête xwendin, merv diverîse. Lewra ev rûpel, rûpelên pîrr genî û bêhnixirab in. Yanê bi kurtasi, ev axa erdê bi xwîna însanan hatiye sitirandin. Ev xwîn, dibe ku xwîna heqdar û neheqan tevlîhev bin. Lîhemâ bi gotinek rast û vebirr, gelekiya vê xwînê, xwîna heqdar û bindestan e. Lewra heqdaran xwedîrehim û însaf in; ji xwînrijandin û mîrkujiyê hez nakin. Şer û têkoşîna heqdaran, an ji bo parêzandina jîyanê, yan jî ji bo cîhanîna maf û mafxwaziyê ye. Zilm û sîtemkarî, mîrkujî û kedxwarî, dîjê tebîeta heqdar û

## EBDILAH AMED

bawerbîran in. Lewra her giya li ser kok û rîçika xwe şîn dibe. Her tişt û her kes jî ancax tebîet û xûyê xwe dide xuyakirin.

Heq û heqdarî; timî bi rîndî û bi qencitî, heqwxazî û dadvaniya xwe li cîhana mirovatiyê da-ye xuyakirin û nîşandin. Yanê jiyan û hebûniya xwe bi van rengderêñ xwe domandiye. Lîhemâ neheqî, zordarî û sîtemkarî; bi peyrewêñ xwe, herwekî navêñ xwe, ti rîndî, qencî û hêjatiyek nedaye mirovatiyê. Tim bi zordarî û dîktatorî xwe daye pejirandin û tim bi destûren mirovkujî û dijimirovatî û bi fêlbaziyêñ curecur xwe daye domandin. Bi vî awayî, naveke genî û xirab li dawiya xwe hiştin.

Binêrin li dîrokê, ji mîj ve navê pêxemberan bi rîndî û rehmxwendinê tête behskirin. Hemen pirraniyêñ mirovan, dixwaze misliman bin, dixwaze file û cihû bin, navê zarokên xwe, bi navê wan pêxember û peyrewêñ wan navdar dikin. Lîhemâ, ji dervê ruhperest û nijad-bîran, ti mislimanek, fileyek, ci-

huyek an mangeperestek, navê zarêñ xwe, bi navê Cengîz, Hullagu, Sezar, Nemrud, Fîrawn, Ebucehil û hwd navdar nakin. Lewra ewana û yên weke wan, nav û berhemeke xwes li dû xwe nehiştine. Ew hemû devgenî ne û lepbixwîn in. Belê, ji-yana wan kesan, an rejîm û sazumanêñ wan, bi xwînvexwarî, kedxwarî, heramxwarî, koledarî, sîtemkarî û herwekî vanan meşiyaye.

Dumahiya vê şîrovê re, ez dibêjim ku, pirsgirêk û gelemşeya Kurdan jî, di vê çarçivê de divêt bête tehlîlkirin. Lewra, gelê Kurd, ji mîj ve bigre û were het-a vê dema nûha, tim bawerbî û dadxwaz in. Heqperestî û maf-perwerî, destûra wan a pêsem e. Zilm û sîtemkarî nexwestine û nekirine. Serfildanêñ wan ên bi navûdeng, li hember zilmê, zordariyê, bêdîniyê û kufirba-ziyê çebuye. Dibe ku hatibin an bêtin xapandin, lê bi zanayî mêldarêñ neheqiyê yan kufrê nebûne. Gerçi, mixabin ji alê şahêñ Îranê û padîşahêñ Tûraniyê gelek caran hatine xapandin; bi destê wan gelek xwîn dane rijandin an xwîna wan ha-

tiye rijandin. Wekmîna ferman-derxistina Ermeniyan. Lê eviya ji, ji nezanî, hevnegirtinî û ji bê serokatiya wan pêşve hatiye. Belê Kurdan, bûne qurbana şah û împeretoran. Ev qurbaneti ji, ji van her sê dijminen wan, pêş ve hatiye: Nezanî, xizanî û neyekbûn (:ixtflaf).

Rastiye dîrokî heye: Gelê Kurd û Ermeniyan bi hezaran sal cîranen hev bûn. Kurd misliman, Ermenî file bûn. Bi hev re xweş derbas dikirin. Ji rinditiya İslâmê û muamela Kurdan gelek kîfxweş û memnûn diman gelên Ermenî. Gêlek ji Ermeniyan bi dilxwezî û hêsanî dibûn misliman. Lê malxirabê padışah, ev dost û cîranan bera ser hev dan. Tov û toximê neyartiyek qedim xistin nava van her du gelan. Ji nezaniya Kurdan sûsistifade kirin û gotin: "Ew file ne; wan bikujin. Ko hun wan bikujin, hun dê têkevin behîstê..." Belê, ev dîn, ne dînê İslâmê bû. Dînê padışahan bû. Lewra di vî dînê pak û spehî (:Islam) de tada û kuştina bêgunehan tîne ye... Ev bela bi destê sultanê Osmanî qewimî li ser vî gelî. Dawî ci bû?.. Bi sedhezaran kes, ji herdu aliyan hatin kuştin. Zar û zêç, keç û xort, nexweş û îxtiyar, kal û pîr, tev... Bi sedhezaran... Nezanî disa bû bela li serê gelan.

Ko pirsgirek sirf bi vê nimune ya jorîn bimana, disa baş bû. Dijminen İslâmê rihet nesekinin û hê ji nasekinin. İro ji, bi toyçandina ruhperestiya nav gelên misliman, Kurd ji Tîrkan re; Tîrje Erebân re; Ereb ji Persan re; Pers ji Kurdan re; Kurd ji Erebân re û wekmînayê vanan ji hev re kirine dijmin. Lê ma çîma?.. Xwedayê me yek, kitêba me yek, pêxemberê me yek, dînê me yek, qibla me yek û bi hezaran yek; herî pêş ve, ji bo hemû mirovan, dayika me Hew-

wa, bavê me Adem ji yek e. Naxwe ev dijminaşî ji bo ci ye?!

Lêhemâ ev rastiya ku li ber çava ye, ji alî dijminen me yên navgelerî û dûvik û qemçikêd wan ên ku di nava me, an di serê me de ne, bi fitneya gelperistî û axperistî ev braşî û yekitiya mislimanan perçê kirin û bi vî awayî astengeyên li ber da-



girkerî û xwînmijiya xwe rakirin. Bi vê êş û nexweşîya gelperistî - nabêjîm gelperwerî - ol û baweriya mislimanan avêtine plana paşem û fîkr û hêzirêd nijadperestiyê pêşkeşî ber mislimanan kirine. İcar, ciqas em ji ol û baweriya mislimantiyê dûrketine, ewqas hov û dijê hev bûne. Halvakî, madem em misliman in, divê hemû bizav, tevger û helwesten me ji mislimanî be. Lê mixabin rîjîmîn diktariyê fermândarêñ dûvikîn emperializma navgelerî, nahêlin ku misliman li bîr û baweriya xwe biarqîlin, an hayidar bin. Mêjiyê mislimanan, bi taybetî yên zarok û xortan, bi hêzirêd qewmî û riheristî dişon, tarûmar dikin. Ji ber vî awayî, problema mezin a herî girîng, ji bo mislimanan, rejîmîn kufirbaz ên diktator in, ku wek reqelan hêlin û warêñ xwe di coxrafya mislimanan de

çekirine. Divê hemû mislimanan di yekitiya Xwedê, di heqîtî û rastiya Pêxember û dîn de li hev bicivin; ji bo şehitandin û qewitandina van rejîmîn zordar ên kaselîs, şoreşek mezina İslâmî çebikin. Ger wilo nebe, ne ku sîrf gelê me û welatê me, wê hemû ax û coxrafya gelên misliman têkevin destê neyarêñ me yên qedîm, ku ew ji Ewrûpa ye û serîkeş Şeytanê Mezin Emerîka ye.

Belê, weke ku min di serî de got, dijminen mislimantiyê, em êrişî ser hev kirine. Wextê ku mislimanan li guhekî erdê ser û pevçûnekê derdixin, dewletên dagirker, ji bo azi-randin û dijwarkirina vî agirê ser, bi kure û neftê diçin ser. Dema xwîna mislimanan dirije, kîfxweş û şad dîbin. Her rojekî mislimanan ku di nava xwe de bi ser derbasdikin, ji bo van dagirkeren devbixwîn, cejn é. Sedema ku iro coxrafya mislimanan buye gola xwînê, İblîsê Mezin Emerîka û dûvikîn wî, go-vend û dîlan girêda ne û tibîska diavêjin, li dorhêla vê gola xwînê. Lê hêviya me heye ku ev kîf û şahiya İblîs û İblîs-kan, wê dirêj nekişîne. Rojekî wê wek împaratoriya Sovyetê lerzek bi wan bikeve û dewra wan ji wê biqedede. Wî çaxî wê bi devûrû têkeve nava vê xwîna bindest û rebenê cîhanê. Em hêvîdarin ku ew ê di nava vê gola xwînê de bixeniqin. Lewra postê me, ewqas erzan nîne.

Nûha daxwaz û merama min eve ku, divê em misliman pêşîya pêşîn ji nav pence û lepêñ rejîmîn li me pelikîne bixelisin. Yanê ji van sazûmanen qeşmer û leyistokîn dervehî (:biyanî) rîzgar bin. Pirsgireka Kurdan û hemû mafxwazan bi qilobandin û qewitandina van rejîman, çareser dibe. Ev baweriya min e. Ger eviya, yanê şoreşek İslâmî çê nebe, ez bawerim ku birîna me

wê herî kûr û dijwar be. Lewra ev buyerên ku li Kurdistanê di-domin, bi me da peyitandin ku, tevgerên qewmî, ne çare ye. Ji ber ku bi vî awayî Tirk, herî tirk-perist û Kurd herî kurdperist di-bin. Reh û ramanê İslâmî ji herdu gelan ji wenda dibe, şunê de reh û ramanê qewmî distîne. Encam ji li ber çava ye: Misliman dibin dijmin û neyarên hevîdu. Çare: Destbratî û piştgiriya mislimantiyê ye. Lewra ev rejîm him dijminê me, him ji dijminê Tirkan e. Saddam him dijminê Kurdan û him ji yê Ereban e. Hafiz Esed him dijminê Kurdan, him ji yê Ereban e. Ger Îran Quranî nebe û xwe rast û tekuz neke, wê him dijminê Kurdan, him ji dijminê Azerî û Persan be.

Gelo ma iro ji bajarê Rîze yê bigrin werin heta bajarê Entakya yê, hemû qeraxê deryayê Tirkiyê, seranser ne kerxane ne? Ev rewş, rewşa serbestiyê ye, an koleti û bindestiyê ye? Belê, gereke em ne paragmatist bin, her tiştî li gor jiyana dinyewî û darîngî nedîn berçavan. Lewra ev rewş ûreveçûna Tirkîyê, jiyana bêdawî tarûmar dike. Heger pozê me bişewite, heger cilkek namus û ar, şerm û fedî bi me re hebe, ci Tirk, ci Kurd dibe, divê em yek bin, pêşî vê tofanê ji serê xwe rabikin... Ji hêştirê (:deveh) pirsîne, "Çima hustiyê te xwar e?" Hêştir wisa bersiv daye: "Ma kûderê min rast e!" Belê ko em dest bi pîsîfî û genîtiya vê rejimê û yêne wekî viya bikin, lazime ku em pirtûkekê binivîsin. Lêhema xweng û brayêن hêja, quna bizinê timî li derive ye, ci hewcîyî şirovekirinê ye.

Belku hun ên bibêjin, "Dah-kereya pirsgirêka Kurdan li kûderê ye, ev tiştîn ku tu dibêji li kûderê ye?" Na... Ez hevparê vê hêzirê nînim. Lewra, heger em wek kalê Selahedîn ê Eyûbî ne-bin, yanê bi hemû mislimanê cîhanê re yekîfî û rîhevaltî, dest-bratî û piştevaniye nekin, em ê

timî tim şerpeze bin. Dema me bi kabik û şerîta şerîta Xwedê girt, wê hemû misliman (ez rejîma qest nakim) li paş û pişta me bin. Na, heger em dîn û baweriyê, di nava felsefa rehpe-restiyê, an endîşeyen netewî de wenda bikin, ez bawerim ku, em ê timî tim tenê bin û bi serê xwe bimînin.

Madem wisa ye, ey gelê Kurd û hemû mislimanen cîhanê! Ka werin, em sond bixwin û peymanê çêbikin li ser tewhîdê. Em sînorêñ ku, ti pîroziya wan tinenin, biçirînin. Ji bo "Yekitiya Komarêni Mislimanî", ji ana ve "yekitiya cihat û komelîsîn mislimanan" çêbikin. Em di nav sînorêñ teng ên ku ji alî dagirke-ran ve hatine danîn de nexeni-qin. Da ku, em him mafêñ xwe yêñ alî, him ji yêñ dunyewî bi hev re bistînin.

Kurdino! Yêñ ku Kurdistan

perce kirine, ne gelê Tirk û Ereb û Fars in. Ev gelanan ji wek me mazlûm in, misliman in. Şah û siltanan guneh kirine, lê ev ne gunehê gela ye. Li ser Kurdan û welatê me cînayeta mezin, cînayeta cînayetkarê Peymana(!) Sewr û Lozanê ne. Yêñ ku Kur-distan perse kirin, ew in, dij-minê mezin ew in. Bi vê perçekirinê tola xwe yêñ dîrokî ji me standin. Lewra, evanan kotekeñ ji kalê Selahedîn û leşkerê wî yêñ lehenger xwarine, hîna ji ji-bîr ve nekirine. Ji ber vê qasê, gereke em wek Donkîşot, bi şâşî çêk û pisatê xwe karanîn nedîn. Gereke em berê pisata xwe bidin neyarê qedîmê hem-demî. Ew ji, dîsa dibêjim; pe-lîdê mezin Emerîka û rejîmê dûvik û serokrejîmê nava me de ne.

Herbimînin bi xweşî û serkeftî.

## Serfiraziya we, serfiraziya me ye

Berî her tiştî ji karkir, karbidest û berpirsiyaren Nûbîhar re, ji ber ku dest bi weşandina kovarek wisa kirine, zehf spas û silavan dikim. Em ji demek zû va li hêviya weşanek wiha bûn. Bi derke-tina kovara Nûbîhar ez gelek dilxwêş û kêfxwêş bûm.

Ez di vê bawerê de me ku ev destpêkirin, ev pêngava hanê, him rûsîpîbûna mislimanan e, him ji ji bo pêşvebirin û nasandîna wîje, ziman û çanda Kurdan, gavek zahf girîng e. Gav, her ci-qas piçük be ji birûmet e. Karêñ wisa feydedar bi vî awayî heta vêgavê nehatine ajotin. Bi kurtayî di vê riye de valahiyek pîr mezin heye. Û ez bi bawerim ku Nûbîhar di tijîkirina vê valahiyê de karêñ pîr girîng wê pêkbîne û wê bibe mînak.

Geli birano! Gava min li Nûbîharê mîzekir bikaranîna hinek bêjeyan dîhna min kişiand. Weke, 'naxwe', 'naxwes' û hwd. Lîbelê weke ku hun ji dizanîn di nav gel de 'nexwe', 'nexwes' tête gotin û bikaranîn. Sedema vê bikaranînê çiye? Ko hun îzah bikin pîr şanaz dibim. Û heke wateya (:maneya) helbesten Mela Eh-med ê Cizîri bê danîn, wê pîr baş bibe. Lewra giştî xwendekar tam jê famnakin.

Dîsa, ji ber hesasiyeta we ya li ser "Pirsgirêka Kurdan" we spas dikim. Dilovanî û merhamet û selama Xwedê li ser we be. Xwedê alikarê we be. Di vê şop û riye de Xwedê we serfiraz bike. Serfiraziya we, serfiraziya me ye.

Ez birakê we yê Elî Hikmet, ne zanyar ango niviskar û hel-bestvan im. Lîbelê, ez dixwazim ku wan pîrsîyaren we yê di der-heqê "Pirsgirêka Kurdan" de li gorî dîtin û ramanê xwe bîbersi-vînim.

**Elî Hikmet Tekin**

## Berpirsiyarê Giştî yê kovara me SABAH KARA:

# "MISLIMAN GEREKE MUHEQEQLI PIRSGIRÊKA KURDAN XWEDÎ DERKEVIN"

**H**eftenameya *Azadî* bi Berpirsiyarê Giştî yê kovara me Sabah Kara re hevpeyivînek tertîb kir û metna vê hevpeyivîna bi zimanê Tirkî, di hejmara 35 a bi tarîxa 10-16 Çileya Paşîn (:10-16 Ocak) 1993 ya heftenameya *Azadî* de hate veşandin. Metna vê hevpeyivîna ku bîrâyê me Hozan Oflaz ji heftenameya *Azadî* wergerandiye Kurdi, li jêr hatiye:

**Azadî:** *Nûbîbar cîma derket; fîkr û raya we ya weşandinê çî ye?*

**Sabah Kara:** Fonksiyoneke ji fonksiyona îdeolojîk pîr mezintir û *Nûbîbar* heye. Lewra bi her zimanê ku hun dixwazin, hun karin ideolojiya xwe ïzah bikin û bibêjin. İro ko hun ideolojiya xwe bi Tirkî ïzah bikin, pîr rahettir û hêasantir e. Kurdi ev sedsalin di nesrê de nehatiyê şuxulañdin. Gerçi şairên me bûne û hene, lêbelê nivîskarê me yên nesrê, em karin bibêjin ku nebûne, yan pîr kêm bûne. Yenê ku hene jî, van nêzîkan dest evêtine vî karî. Loma ïzahkirina îdeolojiya xwe bi zimanekî ku hê nesra wî zêde bi pêş de neçûye, wê we tixûb bike. Yanê deranîna kovareke Kurdi ji bona weşandin û teblîxkirina îdeolojîyekê, iro wê tixûban li ber we veke û hun dê nikaribin îdeolojiya xwe bi hêsanî ïzah bikin. Loma fonksiyona eslî û bin gehî ya *Nûbîbar*, ne weşandin û teblîxkirina îdeolojîyekê ye. He-

ger nêta we ew be ku hun îdeolojîyekê biweşînin û teblîx bikin, hun dê ji bona vî karî hêsanterin zimanî tercîh bikin û hun dê wê îdeolojîyê bi wî zimanî teblîx û ïzah bikin. İro li Tirkîye ev ziman, Tirkî ye. Yanê heger me *Nûbîbar* bi nêta weşandina îdeolojîyekê xas û bi tenê, ji bona teblîxkirina îdeolojîyekê bi dîgeran derxistibane, heger nêta me bi tenê ev bûna, me nê ji zimanê ku em karin xwe bi hêsanî ïzah bikin, îstîfade bikirane, ku ew ziman jî Tirkî ye. Lêbelê zimanê *Nûbîbar* Kurdi ye. Ev jî wê nîşan dide ku, nêta me ya eslî û bingehî ne ew e ku em îdeolojîyekê bi dîgeran teblîx bikin.

Naxwe armanca eslî ya *Nûbîbar* ci ye? Armanca eslî ya *Nûbîbar* ew e ku zimanê Kurdi bighe wê merhaleyê ku Kurd bikaribin xwe bi vî zimanî ifade bikin. Em dixwazin ku em Kurdi bîghînin wê sewiyê ku tê de mefhûmên nûjen û muasir, term û istilahê nûjen û muasir werin bikar anîn û em kêmasyîn nesra Kurdi kêm bikin; û ilawê li vê xebatê, em dixwazin ser îdeolojîyê jî bisekinin. Yanê îdeolojî pişti van e. Armanca eslî ya *Nûbîbar* ev e ku Kurdi bibe zimanekî nûjen û muasir. Mana nûjenbûn û muasirbûna zimanekî ci ye? Mana vê ew e ku ew ziman karibe pirsgirêkên nûjen û muasir ifade bike, pirsgirêkên nûjen û muasir hemêz û

ihate bike. Armanca esasî ya *Nûbîbar*, ev e. Yanê *Nûbîbar* dixwaze nîşan bide ku weke ku bi Kurdi şîr têne nivisandin, dibe ku bi Kurdi meqaleyê pîr hêja û biqîmet jî werin nivisandin. Em dixwazin ji cihekî dest pê bikin û di vê xebatê de pîrûz bibin.

Em dixwazin deriyê me ji hemû spehîtiyan re û ji hemû rastîyan re vekirî be. Em dixwazin xwedyê çavêن bîvan û guhêñ bihîstvan bin. Em dixwazin xwedyê zimanekî rastbêj bin. Ti ideayeke me yî wisa tineye ku em ti xeletiyan nakin. İnsan beser e, dibe ku xeletiyan bike. Lêbelê ya giring ewe ku merev qesten xeletiyan neke û wextê ku xeletiya xwe dît, dev jî wê xeletiyê berdê. Polîtîkaya me ya eslî li ser vê esasê teşkil buye. Yanê em dixwazin alîkarê spehîtiyê bin, alîkarê rastiyê bin. Em dixwazin rastiyê bibêjin û tiştîn ku dibin û diqedin bi şiklekî rast û qenc biwezinînin, diyar bikin, bibînin û bîbhîsin. Di vê navberê de heger em xeletiyekê bikin, em dixwazin nîşan bidin ku em hazir in ku derhal ji wê xeletiyê vegeerin.

**Azadî:** Bi navê *Nûbîbar* bun xwe di kîja alîtyê stiyasetê de dibînin?

**S. Kara:** Bi qenaeta min, nav pîr zêde mana ifade nakin. Yanê min ji mislimanan hinin wisa dîtin ku ji faşîsteke herî faşîst ferqa wan nebû. Min ji mislimanan hi-

nin wisa dîtin ku bi qasî ku merev nexwaze bi wan re biştexile, dogim û dogmatîk bûn. Lêbelê min vî halî di nav yên ku mensûbê îdeolojiyên din in de jî dît. Di nav marksîstan de jî henin ev, di nav faşîstan de jî henin. Lêbelê weke ku di nav mislimanan de însanın pirr delal henin, di nav marksîstan de jî însanîn pirr hêja û yên ku ez ji sohbeta wan pirr kîfxweş û dilşa dibim jî henin. Ya rast, min van cûr mirovan di nav faşîstan de nedît, lêbelê ez karim bibêjim ku min evan di nav cepiyen de dîtine. Naxwe gereke nav, me nexapînin. Yanê ev gotina "ez filan îdeolojiyê qebûl dikim", weke wê ye ku navê merev Hessen, Mihemed û hwd be. Gelo ew meriv di wê îdeolojiyê de çiqas semîmî ye, wê îdeolojiyê bi ci heddî semîmane qebûl kiriye, gelo ew wê îdeolojiyê heqîqeten ji bona menfaeta gelê xwe dixwaze, yan ne? Eslê kar ev e. Naxwe gereke em ji esil dest pê bikin. Gereke em zêde li ser navan nesekinin û em bi navan nexapin. Yanê heger mirov semîmî be, ne dogim be, heger mirovek ku dixwaze tiştê ku dibin û têne meydanê di cih de biwezînîne û diyar bike be, ew bi me re ye û em jî bi wî re ne. Lêbelê heger ne di vî halî de be, ewa ku navê wî bi me re yek e, ti mana ifade nake. Ez vê eşkere dibêjim, ez dixwazim bi îsrar bibêjim ku heger mirov ne durust û semîmî be, ne birûmet û heysiyet be û nexwaze ku çavên wî bînvan û guhêñ wî bîhîstvan û dilê wî hesvan be, ne xebite ku wisa be, eva ku navê wî misliman e, ji me re ti mana ifade nake. Li hember vî halî, mirovê ku xwedyê wan xusûsiyetan be, lêbelê navê wî marksîst be, navê wî marksîst bûn, wî ji me û me jî wî bidûr nake.

**Azadî:** Cib û fonksiyona mislimanen Kurd di têkoşîn û mu-


*cadeleya netewî ya gelê Kurd de gereke ci be?*

**S. Kara:** İslama ku ez nasdikim —ku ez ji zarokiya xwe heta nuha sîstema İslâmî tehqîq dikim û lêkolînê li ser vê sîstemê dikim— ev İslâm, mirovan dawatî însanbûnê dike. Ko em vê bi ayetê Qur'anî ifade bikin, Qur'an însanan dawatî tebîet û fitreta ku li ser xuliqîne dike. Mana vê ci ye? Bêjeya "însan" ji koka "uns"

Xweda qêbûl bike, bibêje ku "ez Xweda qebûl dikim" û him jî tiştê ku ji xwe re dixwaze, ji dîgeran re jî nexwaze? Ma nizane ku Xweda dibîne? Ma nizane ku Xweda her tiştî diwezinîne û qîmeta her tiştî diyar dike? Çawa dibe ku meriv him bi axîretê bawer be û him jî tiştê ku ji xwe re dixwaze, ji yên din re nexwaze? Naxwe ev tiştê ku Peyamber (selama Xweda li ser be) dibêje, heqîqeten xulase û vebirîya İslâmî ye. Yanê heqîqeten mislimanbûna kesê ku tiştê ku ji xwe re dixwaze ji bîrayê xwe re naxwaze, pirr meşkûk e, pirr şîdar e. Baweriya wî bi Xweda pirr şîdar e. Baweriya wî bi axîretê pirr şîdar e. Peyamber (selama Xweda li ser be) wisa dibêje.

Min vê çîma got? Halê Kurdan di masetê de ye. Kurd heqîqeten pirr eziyet dibînin û di bin feşar û tezyîqeke pirr zêde de ne. Zimanê wan hatiye qedexekirin. Çanda wan, yanê kultura wan hatiye qedexekirin; bi ser de jî, hatiye tâlankirin. Ti mirovê birûmet, bişeref nikarê

bibêje ku "Kurd ne di bin zilmê de ne." Ti kes nikare miroveke birûmet peyda bike ku ew mirov karibe bibêje ku "Kurd jî xwedyê mafêñ ku her gel xwedyê wa ye." Naxwe yên ku van heqan, van mafan ji Kurdan re jî naxwazin, nikarin bibêjin "em misliman in." Ko vê bibêjin, ev dê bêmana be, dê nerast be. Yan dê van heqan ji Kurdan re jî bixwazin, yan jî dê İslâmî terk bikin, dê nebêjin "em misliman in." İslâm vê şertê dide pêş, vê dixwaze. Naxwe li gor vê, bi qenaeta me gereke misliman muheqeq li pirsgirêka Kurdan xwedî derkevin. Misliman gereke muheqeq li pirsgirêka Kurdan xwedî derkevin. Misliman mecbûrin ku bawer bikin ku gereke Kurd bibin xwedyê hemû mafêñ ku gelên din xwedyê wan in. Heger bi vê nebawer bin, dê



hatiye asfirandin. "Uns" tête mana nêzîkbûn, bi yê din re li hev bûn, bi aşitiyê mayilbûn, lêkbûn, gelemerî û civakîbûn û sosyalbûnê. "Enîs" tête mana mirovê ku bi mirovên din nêzik, dilovan û yê ku meriv kare pê re biştexile. Kelîma "însan" jî ji wê kokê têt. Yanê İslâm ji însan dixwaze ku weke xwe be, li gor eslê xwe û fitreta xwe be. Heger em bixwazin vê bi destûreke dinê İslâmî bibêjin: Ji Peyamber (selama Xweda li ser be) xulase û vebirîya İslâmî dipirsin, tiştê ku li wan divegerîne, ev e: "Yek ji we îman nayîne heta ku tiştê ku ji xwe re dixwaze ji bîrayê din ê xwe re jî nexwaze." Yanê merivê ku vê nexwaze, nikare bibe misliman. Ev prensîbeke esasî û bingehî ye. Xulasa İslâmî ye ev. De ka bifîkirin: Çawa dibe ku meriv him

mislimaniya wan pirr şikdar be, dê kes bi mislimaniya wan bawer neke.

Wextê ku hun li mazî û dîrokê mêzegin hun dê bibînin ku xwedyê esliyê pirsgirêka Kurdan, misliman in. Ev di hadisa Şêx Seîd de wisa ye, di hadisa Seyid Riza de wisa ye, di hadisa Berzençî de wisa ye. Gişt wisa ne. Berzençî bi Îngîlîsan re li hev nehat; teklifa wan red kir. Ji ber ku misliman bû, red kir. Guman dikir ku hukûmeta TC dûmâyîk û dewama dewleta Osmanî ye û dê halê Kurdan hê jî bi pêş de bibe. Loma heta talî li benda arîkariya Meclîsa Ewil ma. Lêbelê nizanîbû ku Mustefa Kemal, Meclîsa Ewil fesx kiriye. Nizanîbû ku li ser Meclîsa Ewil lîstikin têñ lîstîn. Heta talî li benda arîkariya Meclîsa Ewil ma, lê arîkarî nehat û talî mexlûb ket, birîndar bû û weke ku hun zanin, nefi Hîndûstanê bû.

Ev hal li Îranê jî wisa ye. Di serê kesen ku Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê damizrandin de jî mela û seyda henin, misliman henin. Wextê ku tarîxa Kurdan tet-qîq bibe û li ser lêkolîn çêbibe, ti kes nikare mislimanan gunehkar bihesibîne û wan mahkûm bike. Misliman weke ku di cebha siyasi de xebîşne, di cebha çand û kultura Kurdî de jî tişte ku ji destê wan hatiye, kirine û roleke pirr giring û cidî ifa kirine. Heger ewan nebûna, ev kitêb û eserên Kurdî dê di destê me de nebûna. Ji Ehmed ê Xanî bigre heta Betê, heta Melayê Cizîrî, heta Seyda Bedîuzeman Seîd ê Norsî û hetta, heta endamên Cemiyeta Tealiya Kurdan (:Kurd Teali Cemiyeti), gelek kes seyda û mela ne. Erê, tişte ku wan kirine, bi mana kamil têra pirsgirêkîn iro nakin. Lêbelê tişte ku wan rojan de jî destê wan hatiye, kirine. Iro tişte ku li para me, li para me mislimanan dikeve ewe ku gereke tişte ku wan kirine em hê jî bi pêş de bibin.

Baweriya min eve ku gereke Kurden misliman bibin rêber û pêşvan. Û di nav hemû grûban de grûba herî muhîma ku kare vê bike jî ew in. Lewra jî dînek dane

rê ku bi dilê gelê Kurd nifûz kiriye û ev sedsalan in ev gel di vî dînî de heliyaye û li gor vî dînî şikil girtiye û bi çanda vî dînî hemhal buye. Yanê ji Kurden misliman re pirr haziriyan hene di nav gelê Kurd de. Mizgeft hene. Gelê Kurd bi pirranî diçe van mizgefstan, weya ev din bi pirranî bi hemû adet û ananeyên Kurdan tasîr kiriye. Yanê li gor grûbê din ên ku ti haziriya wan di nav gelê Kurd de tineye û gereke wan haziriyan pêk bînîn, haziriyan mislimanan ji berê ve pirr in û karin ji van haziriyan iştîfade bikin, van haziriyan tadîl bikin û gelê Kurd bi pêş de bibin. Naxwe gereke misliman di vê xebatê de bibine rîber û pêşvan. Gereke pirr birûmetî hereket bikin, li zahmet û müsîbetan tehamul bikin û muheqeq pîrûz û serfiraz bibin. Weke ku min got, ev, mesela mislimanbûn û nebûnê ye. Yanê heger em vê pirsê hel nekin, dê mislimaniya me pirr meşkûk û şikdar be. Ko em berê xwe jî ve pirsê bi guherin, dê mislimaniya me pirr şikdar be.

**Azadî:** *Te got, Kurden misliman di mazîye de pêşvanî û rîberiya têkoşîna neteweyîtyê kirine. Baş e, lê gelo halê wan ê iroyîn çi ye?*

**S. Kara:** Digel vê qasê ku ewil mislimanan xwedîtiya vê pirsê kirin û xwedyê esliyê vê pirsê misliman bûn, malesef em ji wê pirr bi dûr ketin. Em roj bi roj ji wî halî bidûr ketin. Di şertîn Tirkîyê de fêhmeke İslâmî yî tevlîhev bi ni-jadperistiya Tirkî pêk hat. Û nav em xapandin, me xwe di nava vê de dît. Me xwe bi şiklê partîyê di nava vê de dît, me xwe bi şiklê komelê di nava vê de dît. "MTTB", "Akîncılar" û hwd. Ew ku weke ku navê van komelan ji nîşan dide, di nav iş de buûteke ni-jadperistî jî hebû. Halê "Akîncılar" û "Millî Türk Talebe Birliği" û "Millî Selamet Partisi" û "Refah Partisi" û ittifaqa RP bi MÇP re û hwd.

Yanê ya rast, me di dewra tâli de imîshaneke baş neda. Ewil me xwedîtiya vê pirsê kiribû. Ji Mela Mustefa Barzanî bigre heta

Berzençî, ji Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabad bigre heta serhildana Şêx Seîd û heta Seyid Riza, pêşvanî û rîberiya vî karî di destê alim û rewşenbirê misliman de bû. Lêbelê ya rast, di dewrê dûre de, bi qewla Tirkî, em di sinifê de man.

Ji sala 1970 û pê de di nav mislimanan de hişyarbûnek dest pê kir. Hişyarbûneke siyasi. Ji hev cûdabûnek dest pê kir. Bi damizriya MHP û MNP, kesen ku berê pevre bûn, hêdî hêdî ji hev dûr ketin û di sazûmanen cihê û cûda de civiyan. Pêvajo û veştreke nû dest pê kir. Şoreşa İslâmî ya Îranê vê cûdabûnê hê jî perçinand û kûr kir. Yanê cûdayiya ku ji salen hefteyî dest pê kiribû, di salen hefteyî de hê jî bi pêş de çû û merhaleke nû hate holê. Em dibînin ku ji sala 1980 bi vir de Kurden misliman li ser pîrsa Kurdan pirr zêdetir disekekin. Her ci neticeya ku em gehîstineyê ne pirr baş û ne pirr mureceh be jî, halê me yê iroyîn ne pirr nebaş e. Yanê em cardin ketin merhaleya xwedîtiya vê pirsê. Li gor raman û baweriya min, ev 10 salen li ber me, 8-10 salen heta sala 2000, ji vê cihetê ji me re salen imîshane ne. Yan dê xebat û cehda me, me bike xwedyen heqîqî yê vê pirsê, yan jî em dê ji masetê bi kenar bikevin. Han, bi navê Nûbbîbar em dixwazin vê xebat û cehdê pêk bînîn. Em dixwazin vê rewşenetiyye pêk bînîn. Em dixwazin bikin ku misliman li vê pirsê xwedî derkevin. Ez umêd dikim ku dê wisa jî bibe.

**Azadî:** *Li vir tiştek beye ku dîqatân bi ser xwe de dikşîne. Tu bebsa xwedîtiya vê pirsê dikî. Gelo bi vê gotinê tu dixwaze bibêje ku "Em dê bi tenê û bi serê xwe vê pirsê hel bikin", an ne?*

**S. Kara:** Em dixwazin bi hemû grûbêku ne di halê devgirtina yê din de ne û nabêjin "gereke hun îlahim tişte ku em dibêjin qebûl bikin" û ne di halê diktatoriye de ne re bipeyivin. Em dixwazin bi hemû van grûban re rûnên û pirsgirêkîn xwe munâqeşe û munazere bikin. Em dixwazin bînîn ku em çiqas ka-

rin bi wan re hevkariyê bikin. Lîbelê tehamula me bi berxwerda diktatorane tineye. Yanê ne em dixwazin di berxwerdeke diktatorane de bin û ne jî em karin bi kesen ku di berxwerdeke diktatorî de ne musamehê nîşan bidin. Ji bil yên ku berxwerda wan diktatorane ye, hemû grûbênu ku semîmî ne û karê wan bi gotinên wan li hev dike, ew bi me re ne û em jî bi wan re ne.

**Azadî:** *Gelek grûb dibêjin ku raman û dîtinâ siyasi ya wan ci be bila bibe, gereke hemû kesen ku di musterekên esixerî de weke hev difikirin, li cem hev bin û pevre bin. Di heqê vê defikra te ci ye?*

**S. Kara:** Ewil gereke em mîzegin ku muşterekên esixerî ci ne. Bi qenaet û baweriya min, giringirîn muştereka esixerî, birûmetbûn e. Yanê gereke yên birûmet, semîmî, dûrist û dilsoz û yên ku zîkzak nakin, pevre bin. Yanê bi baweriya min girêka muşterekiyê, pirsa şexsiyetê û bişexsiyetbûnê ye. Aya xên ji vê, ci ye? Iro dê fîkr û baweriya we filan tiş be; ko hun birûmet bin, ko hun pirr lêkolînvan û tehqîqvan bin, heger rojekê hun bibînin ku fîkr û baweriya we xelet e, hun de wê fîkr û baweriye terk bikin. Naxwe iro di xeletiyê de bûna we, ne pirsgirêkeke giring û cidî ye, heger hun birûmet û biheysiyet bin. Lîbelê ko hun nebirûmet û biheysiyet bin, dê xeletiyêne we yên iro, di hatiyê de problamên herî mezin bi xwe re bînin. Naxwe gereke em muşterekiyê di vê noqtê de girêk din. Weke ku min got, di vî işî de muşterekî, semîmî yet e, dûristî ye û tişte ku merev ji xwe re dixwaze, ji dîgeran re jî xwestin e. Wextê ku terefdarêne merev zilmê bikin ko merev bêdeng bimîne, lîbelê wextê ku bi terefداران wî piçûkterîn zilmek bibe, ko merev feryad û fîgan bike, ev ne semîmîyet e. Gereke merev li hemberê her cûr zilmê be û bi her cûr zilmê re mucadelê bike. Berxwerda me rivê birûmet ev e. Gereke merivê birûmet wisa hereket bike. Ko bîrayê wî jî zilmê bike, yan dijiminê

wî, ferq nake, gereke li ber her duwan berxwerda wî yek be û li ber her du zilman jî bisekine. Lewra encax wextê ku hun vê bikin hun karin bi mirovan û bi gelê xwe işimad nîşan bidin û işimada wan qezenc bikin. Hun ji kîja grûbê bin, ne muhîm e. Ji PKK, yan ji grûbek din. Heger wextê ku terefdarêne we zilmê bikin hun bêdeng bimînin, lê wextê ku bi terefdarêne we piçûkterîn zilmek bibe hun qiyametê rakin, bi vî halê xwe ve, hun nikarin bi gel işimad nîşan bidin û işimada wan bi dest bînin. Naxwe ez tek-rar dikim, di esasa muşterekên esixerî de semîmîyet, dûristî û birûmetbûn heye. Em bi yên ku wisa ne re pevre ne, em dê bi wan re pevre hereket bikin. İro dibe ku di xeletiyê de bin, dibe ku ideolojiya wan bi me re ne yek be. Ev zêde ne muhîm e. Em de ji wan re izah bikin, dê jê vegeerin. Weya heger em di xeletiyekê de bin, dê ji me re bibêjin û em dê ji wê xeletiyê vegeerin. Yanê ji ber ku em xelasiya xwe û gelê xwe di vê ideolojiyê de dibînin em di vê ideolojiyê de ne. Em ne di wê korekoriyê de ne ku em bibêjin “Ko xelasiya me jî, perîşantiya me jî, rezîtiya me jî di vê ideolojiyê de be, em cardin jî di vê ideolojiyê de ne û em dev jê bernadin.” Ne mumkin e ku hiç meriveke birûmet vê bibêje. Naxwe heger rojekê em bibînin ku ideolojiya me nikarê me xelas bike, em dê dev jê qerin. Wilqas besît. Lî gereke terefê muqabil jî karibe vê bike.

Naxwe muhîmtirîn muştereka esixerî, semîmîyet e, dûristî ye, guh dan bi hev e, guh dan bi dîgeran e û heger ên din rast dibêjin, birûmetane qebûlkirina gotinên wan e. Yanê gereke em nebejîn ku “Madam filan dibêje, naxwe ez qebûl nakim.” Ev ne ti mantiq e. Kî dibêje bila be, piçûk an mezin, ev ne muhîm e. A muhîm ewe ku gotina wî rast be û di cih de be. Bi ifadeya Peyamber (selâme Xweda li ser be), “Hîkmet, malê windayî yê mûmin e; li kûderê peyda bike, distîne.”

**Azadî:** *Di vî halê şroyîn de di*

*beqê lizûm û acîliyeta van cûr yekîtiyan de tu ci difikirî?*

**S. Kara:** Min di nivisareke xwe ya di *Nûbîbar* de, ifadeke wisa bikar anî: “Tu serê vale hilde nehilde ci fêde!” Naxwe ya muhîm, ne “serhildan” e. Ya muhîm ewe ku meriv “serê tişe hilde.” Serê ku zane dê ci bike ko bibêje “Ez qebûl nakim!”, gotina wî bimana ye. Heqer na, di serê mîro de tiştek tineye, dibêje “Ez qebûl nakim!” lê ne malûm e ku dê ci bîne; ev serhildan bêmana ye. Yekîti û hatin cem hev jî wisa ye. Weke keriyê (sürü) hatin cem hev û yek bûn, bêmana û beyhûde ye. Dê hiç menfaeti pêk neyne, dê bîn cem hev, leq-leq bikin, hir-gur bikin. Ti mana wê yekîti û hatin cem hev tineye. Naxwe yekîtiya ku em difikirin, gereke meydânî nede vê. Gereke yekîtiyeke bitecanus û biaheng pêk were. Di esasa vê de jî, ew pransibîn ku min berê zikr kirin hene. Yanê birûmetbûn, biheysi-yetbûn, guh dan bi gotinên dîgeran û ko rast be, qebûl kirin, ko nerast be, bi îzahkirina sebebê, redkirin e.

Heger em vê pêk bînin, yekîtiya ku dê di netîca vê de pêk were, kare bibe riya fêde û sûdê. Lî yekîtiya ku ne di vî halî de be, ew yekîti weke yekîti û peverbûna keriyekê ye û bêmana ye, bêsûd e. Naxwe esiltirîn noqteya ku gereke em li ser bisekinin, ev e. Ji bona pêkhatina vê jî, gereke em hevûdu bibînin, em hevûdu naskin û em bi ramanên hevûdu aşina bibin. Di gava ewil de, gereke di nav me de çûn û hatineke pirr zêde mewcûd be. Gereke em hevûdu ziyaret bikin. Gereke em guh bidin hevûdu. Gereke em hevûdu naskin û bizanîn ku em ci difikirin, em çiqas birûmet in, em çiqas dûrist in. Gereke em vê nasîn û aşinatîyê di mudeteke kurt de pêk bînin. Hîc şik tineye ku ev pirsgirêk bê yekîtiye ne mumkin e ku hel bibe. Yanê êdî ev gotin pirr demode bûye: “Dengê destekî tine, deng ji du destan têt.” Muheqeq ku dê ev pirsgirêk bi sayeta yekîtiye hel bibe. Lîbelê ne bi sayeta her cûr yekîti û çawa be

bila be, yekîti.

**Azadî:** *Di Kurdistana Başûr de gesbûneñe muhîm pêk têñ. Hilbijartinek çêbû, meclisa Netewî teşkil bû. Di van nêzîkan de Dewleta Federal hate îlankirin. Tu van geşîtyan çawa dibînî?*

**S. Kara:** Ez bi zêdetî evan bi kêfxweşî pêşwazî û iştîqbal dikim. Ez van, kaftî û bes qebûl namik. Lîbelê ev destpêk e. Weke hemû destpêkan, dibe ku nemukemel be û ev tişteke normal e. Ne mumkin e ku em jê, hêviya mukemeltyê bikin. Berî her tişî, navend û şertên mewcûd nemusaîd in. Îro ya ku Kurd hilbijartinek pêk anîne, pîrr muhîm e. Wellaw zêde ne hilbijartineke azadane û zanayanê be jî, ev hilbijartin pîrr muhîm e. Ez vê pîrr muhîm dibînim. Eva ku Kurd hukûmeteke wisa pêk anîn, min pîrr kêfxweş dike. Lîbelê gereke em li vir nesekinin û em vê hê jî bi pêş de bibin. Gereke em bikin ku Kurd serokên xwe yên heqîqi û rasteqîne bîhilbijêrin. Gereke em bikin ku ev bibe wesîla seadet û xelasiya Kurdan. Ev hê gava ewil e. Ez vê hê gava awil hesab dikim û ez vê bi kêfxweşiyekê pîrr zêde pêşwazî û iştîqbal dikim.

**Azadî:** *Bi fikra te, ev geşîtyenê ku di Kurdistana Başûr de pêk têñ dê bi têkoşînê me yên mintîqeyen din ci ilawe bikin?*

**S. Kara:** Helbetê ku dê ev geşîti bibine mîsal ji mintîqeyen din re. Yanê heger ev hukûmet pîrûz bibe, kamiranî bide gelê xwe û bibe wesîla xweşbextiya wî gelî, Kurdêñ mintîqeyen din jî dê vê ji xwe re bikine mîsal. Dê li birayen xwe yên xweşbext û kamiran mîzekin û dê bixwazîn ku bibine wek wan. Lîbelê heger ev mîsal pîrûz û muwefeş nebe, dibe ku netîceke ber ekis jî bînê holê. Yanê kare bibe sebeb ku yên di mintîqeyen din de ne bibêjin: "Cihê me baş e; ko em di vî halî de bimînin çêtir e."

**Azadî:** *Di vê navendê de, van qezencan bê jî bi pêş de birin çawa mumkin e?*

**S. Kara:** Bi baweriya min, ev hukûmet encax ko dîktatoriye ne-

ke kare muwefeş bibe. Gereke dîktatoriye nekin û iżnê bidin ku her kes û her dîtin û raman, xwe nîşan bidin û ifade bikin. Gereke wextê ku xelq wan nexwaze, bi hêsanî cih ji yên ku xelq wan dixwaze re vala bikin. Serfirazi û kamiraniya wan, bi pêk anîna vê ve girêdayî ye. Ji bil vê riyê, ti rê ne qabil i muwefeşiyetê ye. Lewra riyê din, muxalifê fitret û tebieta insan in. Yanê berxwerda dîktatorane, ti tişî hel nake. Em ji dîktatoriye şikayetê dikan. Ji bona ji beyn birina dîktatoriye em nikarin ji dîktatoriye iştîfade bikin. Yanê heger mîkrobek sebeba nexweşiyekê be, hun nikarin wê nexweşiyê bi wî mîkrobî tedawî bikin. Gereke hun ji wîrûsekî ku kare wî mîkrobî ji masete rake iştîfade bikin.

Gereke hemû civakên ku di her parçeyen Kurdistanê de dijin, di navbereke emîn de guh bidin hevûdu, pirsgirêkên xwe munaqeşe bikin û nîşan bidin ku dê ev pirsgirêk çawa ji masete rabîn. Bi baweriya min, wezîfa me ya esli û pêşin ev e. Yanê gereke em iştîmadê bidin gelê xwe. Gereke gel di heqê me de bibêje ku "Heger ew dibêjin, naxwe rast e; ew ne mirovîn derewgo ne." Tevgera ku nikaribe bi gelê xwe vêna bide gotin, ne mumkin e ku serifraz û muwefeş bibe. Di mudeteke tarîxê de ev nebûye. Kesênu iştîmadê nedane gelê xwe û gelê xwe xapandine, di mudeteke kurt de heliyane û ji holê rabûne. Ji bona ku em tevgerek mandenî û ebedî pêk bînin, gereke em vê iştîmadê bidin gelê xwe. Gereke em vê pêk bînin. Gereke em pirsgirêkên xwe munaqeşe bikin. Lî berî her tişî gereke em iştîmadê bi gelê xwe din. Gereke em bikin ku guh bidin me û pişt re jî em riya hel a ku em teklîf dikan, bi gelê xwe bidin qebûlkirin.

**Azadî:** *Li grîbîn welatparêz ên ku di perçeyen din de ne, di vê navberê de ci wezîfeyin dikevin?*

**S. Kara:** Berî her tişî gereke em ji wan re nebine asteng. Dev ji astengbûnê biqere, gereke em bixebitîn ku karê wan hêsan bibe. Gereke em wan bi gelê xwe bi-

nasînin û xwestinê gelê xwe jî bi wan bibhîsinin. Ji bil vê, herekeeta ku ji wan re bibe asteng û bîke ku ew ji holê rabin, dê bike ku ev qezenc jî ji holê rabin. Hele hele terefدارiya dijminen wan kirin, meselen terefدارiya Seddam kirin, dê bibe mirina wan. Ha te vê kir, ha te mirina wan xwest, ti ferq nake.

**Azadî:** *Pirsa "Ceyşê Mêkut" (Çekicî Güç) tim munaqeşe dibe. Gelo em karin di beqê vê pîrsê de fikra te bistînîn?*

**S. Kara:** Ewelen gereke ev qenc were famkirin ku weke ku hinin guman dikan, Amerika vî "Ceyşê Mêkut" ji bona Kurdan neşandiye mintîqê. Erê îro mewcûdiyeta "Ceyşê Mêkut" di mintîqê de li menfaeta Kurdan e, lîbelê di heqîqetê de "Ceyşê Mêkut" ne ji bona Kurdan bi tenê hatîye mintîqê. Planê mezin ên Amerika li ser mintîqa me hene. Amerika dixwaze kok beredê vê mintîqê. Dixwaze otorîta xwe ya ku pişî Şoreşa İslâmî ya İran heتا sewiyeke hejiya û kêm bû, ji nû ve saz bike. Pişî ku Yekîtiya Sowyetan pare bû û ji hev feşkî, êdî Amerika re "Bakur" ji tehlükêbûnê derketiye. Nuha ji Amerika re esil tehlükê li "Başûr" e. Eva ku NATO rengê quwetên dijmin ji "sor" bediland û kire "kesk" pîrr bi mana ye. Wextê ku li buyerê ji vê cîhetê were meyizandin, dê were dîtin ku di heqîqetê de Amerika dixwaze ji waqia Kurd sûñstîfade bike û bi vê bahanê kok beredê mintîqê û di vir de bibe mandenî û ebedî. Ne bi tenê waqia Kurd, birçtiya Somalî ji yet ji van bahaneyan e. Yanê êdî Amerika fam kiriye ku nema kare bi destê piyonê xwe, bi destê hukûmeten piyoniyê xwe yên mintîqê, mîtinkarî û împeryalizma xwe bidomîne. Ji ber vê yekê, cardin dest avetiye "mîtinkariya kevin" (:eski sömürgecilik) û dixwaze ji wê riyê serwetên mintîqê bimije.

Li gor fikra min, Amerika û umûmen dewletên Xerbi roj bi roj ji "mîtinkariya nû" (:yeni sömürgecilik), yanê mintîqê bi dest û sayeta hukûmeten piyoniyê

xwe mêtin a ku piştî Cenga Cîhanî ya Duyem dest pê kiribûn, hêdî hêdî dûr dibin û divegerin “mêtinariya kevin” (:eski sömürgeçilik) û dixwazin ku cardin hefsaran rasterast têxin destê xwe. Gereke em buyera “Ceyşê mêtukut” (:Çekîk Güç) ji di vê kategoriye de mutalea bikin û bihêjînin. Lêbelê ji ber ku, ko em iro ji “Ceyşê Mêtukut” re bibêjin “De binijel!” (:Defol!), dê Kurd rûbirûyê tevkuji û qetîfama Saddam bimînin, gereke em vê nekin. Lê heman hengama ku em karibin li ser piyê xwe bisekinin, ewîşin karê ku gerrek em bikin ewe ku, em ji “Ceyşê Mêtukut” re bibêjin “De binijê û biqelie!” Lewra di heqîyetê de dijiminê me yên eslî ne piyonnekîn mîna Saddam in, lê dijiminê eslî ew piyonvanen mîna Emerîka û ew “mêtinkariya nû” ya ku navê “Sistema Nû ya Gerdûn” (:Yeni Dünya Düzeni) lê kirine ye.

**Azadî:** *Te tim bi perçinandin têgîband û beyan kir ku tu mu-xalîfî diktatöriyê yi û te got ku gereke merîv gub bidin hevûdu. Ma tu karî bir û baweriya xwe ya di beqê demokrasiyê de ifade biki?*

**S. Kara:** Em demokrasiya mewcûd a Xerbê di wî halî de nabînin û qebûl nakin ku tiştê ku em bi “demokratibûn” (:demokratikleşme) ê dixwazin ifade bikin û nişan bidin, kare pêk bîne û sîstema ku arezuya me ye, bîne holê. Demokrasiya li gor bîr û baweriya îroyîn a Xerbê, nikare vê bike. Lewra demokrasiyek wi-sayîn, di nîhayetê de sîstemek wi-sa ye ku tê de “tehakum û çevsandiniya ekseriyetê li ser eqeliyetê” heye. Heger di meclîseke xwedî 450 nefer mebûs de “Erê” gotin û qebûlkirina 226 neferî, dibe sebeba ku tişték were qebûlkirin an redkirin, naxwe di wirde “tehakum û çevsandiniya ekseriyetê li ser eqeliyetê” mewcûd e. Em vê tehakum û çevsandiniyê red dikin û em bawerîn ku dibe ku sîstemek rastehiztir û dil-soztir peyda bibe. Kare navê wê sîstemê “cumhûriyet” be. Di vê cumhûriyetê de gereke tiştê ku “heqdar” dibêjin, werin qebûlkirin

û tiştê ku “neheq” dibêjin, bêne redkirin. Hilbijartina gel muhîm û giring e, lêbelê ji bona ku ev hilbijartin nebe sebeba “tehakum û çevsandiniya ekseriyetê li ser eqeliyetê”, gereke tedbîrin bêne peydakirin. Mamaflî, hakemtiya gel, muhîm e. Hilbijartin, muhîm e. Lêbelê gereke evan bi mesned û payendeyên dinî ji werin palpişti û payendekirin. Gereke evan bi wî şiklî sîstemeke jiyînê û payandeyan were palpiştikirin û payandekirin ku taliya demokratibûnê nebe “tehakum û çevsandiniya ekseriyetê li ser eqeliyetê.” Yanê gereke wextê ku em ji baranê reviyan, em xwe di binê zîpiikan de peyda nekin. Wextê ku me ji destê oligarşiyê firar kir, gereke em nekevin binê barê “tehakum û çevsandiniya ekseriyetê li ser eqeliyetê.” Lewra di nîhayetê de herdu ji digihîne deriyekî: Deriyê zilmkirin bi zeif û bêtîwanan, an ji zilmkirin bi kesên ku eqeliyet in, ne ekseriyet in.

**Azadî:** *Weke ku tuzanî, roj-nameyên Kurdiî tro men dibin, tênen danbev û bi problemen belavkirinê rûbirû ne. Azadî ji bi van probleman rûbirû ye. Gelo em karin di beqê vê problemê de fîkr û ramana te bistînin?*

**S. Kara:** Eva ku weşana we tête menkirin û pêşî lê tête girtin, pirsgirêkeke mezin û eybeke mezin e. Pêşîya mirovekî girtin û menkirina wî ji ifadekirina fîkrê xwe, eybeke herî mezin e. Gereke herkes karibe fîkrê xwe ifade bike. Bi şartê ku maşî şexsî yên kesên din îhlal neke û derewan neke, tebîtitîn heqê herkesî ye ku fîkrê xwe semîmane beyan û ifade bike. Loma, menkirina mirov ji vê, eybeke herî mezin e.

Naxwe gelo em çawa karin pêşîya vê menkirinê bigrin?

Bi baweriya min, ev ne pirs-girêkek ku îro hatiye holê û îro dest pê kirîye ye. Yanê ev pirs-girêk piştî vetîre û kudîneke pîr dirêj hatiye pêşîya me. Heger ku gelê me em mudafe bikrane û em ji aliye gelê xwe ve bi şikleke mukemel hatibûna palpiştikirin, dê pîr zehmet bûna ku me men bikin û pêşîya me bigrin. Dê gel

rabûna ser piyan. Dê gel rabûna ser piyan û bigotane “Em rojnama xwe dixwazin!” Naxwe gereke em itîmada gel hildine pişt xwe. Ne tenê itîmada gelê Kurd; gereke em itîmada gelê Tirk ji bidest bînin û hildine pişt xwe. Hinin ji xebatêna paşîn, bi şikleke ku di tarîxa Cumhûriyeta Tirkîye de nehaatiye dîtin, gelê Tirk ajoitiye bal rejîmê û kiriye ku Tirk li vê rejîmê xwedî derkevin. Gereke em ber li vê yekê bigrin. Lewra ev rejîm ne tenê dijiminê gelê Kurd e; li gelê Tirk ji zilmê dike û kedxwarî û xwînmîjîya gelê Tirk ji dike. Naxwe gereke em bixebeitin û cehd bikin ku gelê Tirk ji alîkarîya rejîmê neke. Gereke em bîratiya gelan biperçinînin û takîd bikin. Gereke em vê yekê bi şikleke şenber nişan bidin; em civînan girêdin û ji hemû aliyan mirovan dawaşî van civînan bikin û em wê zemîna ku fîkrê xwe ifade bikin, ji wan re amade bikin û bi hemû mirovîn birûmet re rûnên û bîpeyivin.

Gereke em itîmadê bidin gelê xwe. Ev pîr muhîm e. Gereke gel bibêje ku “Tiştê ku evan dibêjin, rast in; evan ji bona me û li menfaeta me dixebeitin.” Gereke em bikin ku ev bibe. Ko em nikaribin vê bikin û em gel nekşînin cem xwe, dê hinin bi hêsanî û rahetî me men bikin û pêşîya me bigrin. Yanê wê belavkirinê bisekinînin û wê me men bikin. Lêbelê heger em karibin piştgîriya gelê xwe hildine pişt xwe, bi ti awayî nikarin me men bikin û pêşîya me bigrin. Gelê me dê rojnama me û kovara me, ko bi usûlê fotokopyê ji be, belavbike. Yanê heger ti fîrsendî nedînê, dê yek nusxe herê û gelê me dê wê bi imkanê xwe teksîr û belav bike. Hetta dibe ku bi destê xwe binvisin û teksîr bikin.

**Azadî:** *Mesaja te bi xwendanen Azadî ci ye?*

**S. Kara:** Mesaja min bi xwendanen Azadî eve ku, li gor navê rojnama Azadî hereket bikin. Bila rewş û tevgera wan azadane be. Ez dixwazim ku di rewş û fîkrê xwe de azadane hereket bikin. Bila mirovan ji ber navê

wan red nekin. Bila rewşa wan ne ew be ku bibêjin "Ev ji me ye; ci bibêje rast e, ci bike rast e!" Yan "Ev ne ji me ye; ci bibêje nerast e, ci bike nerast e!" Hêviya min eve ku, mirovê ku di rewşike xeletî de ye, welew ko mensûb û alîkarê wan jî be, karibin wî red bikin. Ez hêvidarim ku nav, wan nexapnîn. Ez dixwazim hişyar û hayedar bin; xwedyê dilê hisker û çavên bîna û guhêñ bihîstvan bin. Em di vê rewşê de ne, em dixwazin ku em wisa bin û bila ew jî wisa bin. Ez dixwazim hedîsa Peyamber (selama Xweda li ser be) cardin tekrar bikim; lewra hedîseke pirr muhîm e: Gereke her tiştê ku ji xwe re dixwazin, ji dîgeran re jî bixwazin. Hetta gerek wan ji dijminê xwe re jî bixwazin. Yanê gereke nebêjin ku "Dijmin me birçî dihêle, naxwe ka em jî dijmin birçî bihêlin!" Heger riya qeşitandin û defkirina dijmin, wî ta hedekî birçî hiştin be, di gava ewil de, ev kare bibe. Lîbelê piştî ku zilma wî def bû jî, wî birçî hiştin, ne rast e. Peyamber (selama Xweda li ser be) bi baweriya min, pirr bi hay negotiye "ji birayê xwe yê misliman re" û gotiye "ji birayê xwe re." Yanê gotiye: "Yek ji we îman nayîne heta ku tiştê ku ji xwe re dixwaze ji birayê din ê xwe re jî nexwaze." Weke ku hun dibînin, mefhûma "birayê misliman" di vê hedîse de tineye. Sebeba vê nebûnê ji eve: Di fiqh û huqûqa İslâmî de însan du cûr in. Qismek ji wan, di dîn de birayê me ne û qismê din, di esil de birayê me ne. Hemû însanên ruyê erdê du qism in: Qismek ji wan, birayê me yêñ dînî ne û qismê din jî birayê me yêñ eslî ne, yanê ji ber ku însan in, birayê me ne. Ji vê sebebê Peyamber (selama Xweda li ser be) dixwaze ku meriv tiştê ku ji xwe re dixwaze, ne tenê ji misliman re, lîbelê ji hemû însanan re jî bixwaze. Naxwe li gor vê fermanê, welew mensûbê dînê me bin an na, mensûbê îdeolojiya me bin an na, li kî zilm bibe, gereke em li hember wê zilmê bin û em wê zilmê red bikin.

*Ji Tirkî: Hozan Oflaz*

## NAV XWEŞİK Û BÎ XWE XWEŞİK MUHEMMED

Canê mi bi qurbana riya te be  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed  
Li vî evdê feqîr şefaat bike  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed

Pirr û pirr zêde ne derdê mûminan  
Lê li axretê ye zewq û sefa wan  
Ey ti Mustefa yê hijdeh aleman  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed

Heft tebeqe semawat te seyran kir  
Pişt re li ser kursî te cewelan kir  
Di mîracê de te dawa umet kir  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed

Çar yarê guzîn in dostê qencê wî  
Ji guneha dûr dibin dost û yarê wî  
Hijdeh hezar alem fermanberê wî  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed

Ti resûlê heq î bê şek û guman  
Ê bi te muxalif, bê dîn û îman  
Yûnis çib'ke bê te dinya aleman  
Nav xweşik û bi xwe xweşik Muhammed

**Yûnis Emre**  
*Ji Tirkî: Hozan Oflaz*

**REMEZANA WE PÎROZ BE!**

**nûbihar**

*Dua û niyete rojiya Remezanê:*

"Ya Rebî, min rojî ji bo Te git û baweriya min bi Te ye û min fitarê bi rizqê Te kir û min niyete ku bi rojî bim sibehê."

Ya Rebî, Tu rojiya me qebûl bikê û Tu îmana me muqîm bikê û Tu dilê me paqîj bikê û Tu xêr û qenciyê nav me dê belav bikê û Tu jiyana ber me ronî bikê û Tu xweşî û aşîû û selametiyê nav hemû misliman de belav bikê û Tu rizqê me hemuyan zêde bikê û Tu rîka rast nişanî me bidê û Tu me ji qeda û belayen dinyayê dûr bikê. Tu yî Xweda yê Rehmetê, ya Reb el Alemîn!"

**Behram İtmanî**

# QELBÊ MI DINYAY RÊ BESO!

*-Jew qeçî ra, marda  
xwu rê mektûb-*

D a y ê ...  
K a n î  
bewranê  
ki hewra rê perî akerdê? Kanî  
pilpilik? Vilî çirê wina cilmiskya  
yê? Kanî tamê yaxerî, tamê az-  
mînî, sebi tamê hezkerdiş?

Helepcé di çirê qeçî kişyenê?  
Çirê dayê çirê... Maya ki bêşiga  
qeçtê xwu şanena, çirê berme-  
na? Zerya aşıqa çirê tim veşena?

Kanî dayê, girdî kotî dê?...  
Kurdistan, Filistîn û Efrîqa kesî  
ra nê asenê? Çirê nê reynenê bi-  
rayanê mi kişten ra. Ma kes çin-

**MUHAMMED PAŞA**

yo bi remo "ha-  
ho" da ceniya?  
Kes çinyo bire-  
mo ax dê xortan dê hepisxana?  
Kes çinyo derdê qeç dê Efrîqay  
fahm bikero? No dinyayê do  
senîno dayê. Ma rindey ra qe  
çiye nêmend?

Ez nêwazena dayê... Ez  
nêwazena omrî pêroy bi xira-  
beya ravêrنا. Ez nêwazena bin-  
dest ba. Ez qayil niya ki hana  
nêameya dinya, rêzîlê bindes-  
tey mi rê virazyê.

Dayê... Bewranî şî kotî? Qey

cemedey miyandi ïna rê ca  
nêmend... Na esr dijminê evînî  
û zeriya... Dijminê hez kerden-  
ya. Dijminê merdimey û bireye-  
ya...

Mi veradi dayê... Mi verad,  
ez herbê insanetey bida. Şira ê  
zalim girdan ra hesab pers kera.  
Hesabê Kurdistanê pers kera...  
Letê dê xwu birşa Filisûn, letê  
birşa Bosna, letê birşa Moro...  
Qelbê mi dinyay rê beso dayê...

Hey mazlûmê dinyay!... Bi-  
rayê min! Ewro destê mi bê qe-  
wet yê. Hema ê do rojê bibê bi  
qewet... Destê mi do rojê bi-  
resê giryane dê ïna. Ezo wexto  
ïna ra hesabê na esr pers kera.

Ez tora qehrya ya dayê... To  
çirê ez nê kerda aşiqê secadey.  
To çirê dendika cîhadî nê eşt  
qelb dê mi. Ez do waxta tarî mi-  
yan di roşnî, erdandi gul biyayê.  
Ez do zey aw da koyana pak û  
zelal biyayê.

Allah, hewn dê mergî ra  
marê warişen bido.

Heqqê xwu mirê helal ki  
dayê. Lajê to.

## NÊ HÊSRÎ, HÊSRÊ ÇIMANDÊ TOYÊ DAYÊ

Dayê  
Fina qehro vareno  
Mergo vareno qeçan dê bêkesa ser  
Qehr parçêndê heyatê mayo  
Vilê qahrî benê girdî zerî da ma di  
  
Çimê ma dê bivînê Menga Gulân  
Belayê zimistanî qe nêqedyenê dayê

Dayê dirbeta ma giran a  
Nêgêryaya hana  
Gunya şehîdan wişk nêbya hana  
Fina jî derbî varnenê dirbetendê ma ser  
Hezarana şehîdan gunî rîjnê  
Qe nêqedyenê dayê  
Gulî dê çi wext abyê  
Bi gunya şehîdana  
  
Qeçî bê pî benê girdî

Mil çewtyê  
Bar giranyê  
Kaykerdişî nêzanê  
Ez zana dayê ez zana  
Ma qeçê mil şikatanê  
Barê ma çewto  
Dest nêdanê ma dest  
Talanî ra rind fam kenê  
Ez ïna rind nas kena dayê  
Teyaran dê ci ra, kîmyasal dê ci ra  
Qırkerdenê ci ra  
Eşkencê .....

Hêsrê çiman dê to qe nêqedyenê dayê  
Zey yaxerê rehmetî varenê  
Bêşigan dê ma ser  
Ti biberme dayê ti biberme  
Bermayış qederê mayo  
Bizani ki şefaq nezdiyo  
Ti fina herbê jiyanî bidi  
BÌ ŞEREFA

Omer Faruk Çetinkaplan

# ÇÎN ÇÎN KIRIN ZULFÊN SIYA KESK ETLESA DÎBA QEBA

Çîn çîn kirin zulfêni siya  
Kesk etlesa dîba qeba  
Îdî nîşan nabin xuya  
Têkil kirin lazim seba

Min dî seba daye seher  
Madari bedrî kir du ker  
Qews û qezeh jê hate der  
Dîsa bi zulfan ra teba

Îro ji me l'bedra temam  
Enber feşan bin sed selam  
Ey hudhudê şêrîn kelam  
Ehlen wesehlen merheba

Min dilberek wek durr heye  
Mehbûbî şêrîn surhe ye  
Husn û cemalek pur heye  
Belqîs sifet mesken Seba

Şûx û şepala meyperest  
Ew zalima hişyar û mest  
Vê nameyê xef da vi dest  
Fî teyyiha neşru'n-neba

Bêj ew şêrîna surperî  
Durdaneya ez muşterî  
Kan ehd û peymana berî  
Bê fayde çûn şubhi heba

Me'dvê periya dilberê  
Lê hê li uslûba berê  
Lê kifş bibêta j'pencerê  
Bê û biçit teşbîhi ba

Dilber mecalâ name dî  
Nasî ku nîşana me dî  
Nûnek muxalif tê nedî  
Hel qelbuha nehwî seba

Ney şekera'spî dest û zend  
Zanim mecalâ name xwend  
Lêvan tebessim kir ji qend  
Maset kebanin fi ruba

Qasid bi meqsûda me hat  
Ba mujde û emr û berat  
Nîşan hinarin hem xelat  
Şehzadeya gulgûn qeba

Îro mecal lî hat û wext  
Dîsa cuwan bû min dirext  
Ev lami'a daye ji text  
Ma kane berqen xulleba

Selwa rewan zerrîn wereq  
Çiçek Me'lê dîn sed neseq  
Yaçûtuha yehkî's-şefeq  
Yehkî uqûden kewkeba

## Mela Ehmed ê Cizîri

### KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe ve ji hejmara [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kovara *nûbihar*.

**Nav û paşnav:**

**Navnîşan:**

**Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiyê:**

**Li hundur:** Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derive:** Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonatiyê dagirin û tevlî kopiveke pela razandina bedela abonetiyê bisînin navnîşana me.

**Navnîşan:**

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

**Bedela abonetiyê:**

**Li hundur:** 120.000 TL **Li derive:** 50 DM.

**Amojkarî:** Eğitim ve öğretim.

**Banûname:** Dergimizin hanımlar bölümü.

**Berg:** Kitap, dergi kapağı.

**Bersiv:** Cevap.

**Cûr:** Tür, çeşit.

**Destpêk:** Giriş, başlangıç.

**Dimilkî:** Kurtçenin Zazaca lehçesi..

**Durûti:** İkiyüzlülük.

**Erîş:** Saldırı.

**Heftenâme:** Haftalık yayın organı.

**Helbest:** Şiir.

**Hevpeyîvîn:** Sohbet, röportaj.

**hwd:** 'vesaire' anlamındaki 'her wekî din' in kısaltması.

**Kovar:** Dergi, mecmua.

**Lêpirsîn:** Soruşturma.

**Malbat:** Aile, sülale.

**Name:** Mektup.

**Navend:** Merkez.

**Nîvîsar:** Makale.

**Nûdem:** Çağdaş.

**Peyman:** Anlaşma, sözleşme, kontrat, pakt.

**Pêşniyar:** Öneri.

**Pêşwazî:** Karşılama, protokol.

**Pirsgirêk:** Sorun, problem.

**Pirsîyar:** Soru, sual.

**Pîrozname:** Tebrik kartı, tebrik mesajı.

**Qedexe:** Yasak.

**Rewşenbir:** Aydın, münevver.

**Rexne:** Eleştiri.

**Rêkxistin:** Düzenlemek, tertiplemek.

**Rêzepirs:** Bizim dergimizde de yer alan ,bir çok kareden oluşan bulmaca büçimi

**Rizgarî:** Kurtuluş, istiklal.

**Sazûman:** Teşkilat.

**Sedem:** Sebep.

**Serbixwe:** Bağımsız.

**Serefrazî:** Zafer.

**Serketin:** Başarı, muvafakiyet.

**Sernîvisar:** Başmakale.


**Serxwebûn:** Bağimsız olmak.

**Wêne:** Resim.

**Zana:** Bilen, bilgin, alım.

**CEPERAST**

1- Di İslamiyetê de şeveke piir biqîmet, şeva ku Qur'an a Mecîd tê de nazil bûye - Navê diya pêxemberê me Hz. Muhemed (s.) 2- Navê mehekê - Rehet, hêsan - Mêşin, mîh. 3- (Berepaş) Dîn - Şimşire, pegrê tîrî, qırşê fêkiyan - (Berepaş) Keç, keçik. 4- Ferşenî, nêtik - Kesê ku di medresan de xwendîye û içazet standiye. 5- Tiştê ku ji bona zewqê di dev de tê cûtîn - Ruknek ji ruknên nimêjê. 6- Kirin - (Berepaş) Xwelî, xweliya bi tenî - Şikelik, firaxa ji xweliyê hatîye çêkirin. 7- Alek, gep, herdu aliyê rûyê însan - Cinsek ta, celebeke benik. 8- Beyreq - Heq - (Berepaş) Darikê kifritê. 9- Qehremân, leheng, agircav, mîrxas - Dijê nêr - (Berepaş) Beş, kereste, dep. 10- Kesê ku mal parakende difroşe - Niştîman.



**BERSIVA RÊZEPIRSA HEJMARA ÇAREM**

**ÇEPESTAR:** 1- Seîd ê Norsî - Aba. 2-Evdal -Ta - Selîs. 3- Lîr - Cêwî - Serî. 4- Anîn - Alîn - Atom. 5- Sim - Ol- Va. 6- Ex - Ka - Reben. 7- Dotin - Atî. 8- Île - Zad. 9- Îd - Wagon - Kanî. 10- Navcît - Yaran. 11- Sî - În - Nors.

**SEREJÊR:** 1- Selaheddîn. 2- Evîn - Xo- Das. 3- Îdrîs - Tî - Vî. 4- Da - Nikil. 5- Îl - Manewî. 6- Ca - Atî. 7- Otêl. 8- Rawî - Oy. 9- În - Nan. 10- Îs -Oran - Ro. 11- Esalet - Kar. 12- Alet -Bîzans. 13- Bîrove - An. 14- Asîman - Dîtî.

*Amadekar: ALÎ KEÇELÎ*

*Derketin û bilindbûna Nûbihar,  
daxwaziya me ye*

Heval û hogirêن hêja,

Derketin û bilindbûna *Nûbihar*, daxwaziya me ye.

Ez kovara *Nûbihar* pîroz dikim. Jê re jiyanek dirêj, bi serketin û nemir ji Xwedê dixwazim.

**Muhammed Zahid ÖZKAN**

*Naunışana me  
ya nû:*

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3  
Fatih/Istanbul, Tel: 533 75 88

*nûbihar*

# KOVARA İSLAMÎ YA KURDÎ (KÜRTÇE İSLAMÎ DERGİ)

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat  
(Aylık Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

HININ DIXWAZIN ZIMAN Û ÇAND

Û HER CÛR HEBÛNÊN KURDÎ YÊN DIN, JI HOLÊ

RAKIN. WAN KÊFXWEŞ NEKE. KOVARA NÛBIHAR

EWILÎN KOVARA İSLAMÎ YA KURDÎ YE. BIXWÎN, BIDE

XWENDIN Û JÊ RE ABONEYAN PEYDA BIKE. Ev,

MESÛLİYETA TE YA İSLAMÎ Û ÎNSANÎ YE.

(BİRİLERİ KÜRT DİLİ, KÜLTÜRÜNÜ VE

HER TÜRLÜ MEVCUDİYETİNİ ORTADAN KALDIRMAK

İSTEMEKTEDİR. ONLARI SEVİNDİRME. NÛBIHAR İLK

KÜRTÇE İSLAMÎ DERGİDİR. OKU, OKUT VE ABONELER

BUL. BU SENİN İSLAMÎ VE ÎNSANÎ GÖREVİNDİR.)

## weşanên nûbihar

## (nûbihar yayınları)

Rîsala Biratiyê / Seîd ê Norsî

Peyivêن Piçûk / Seîd ê Norsî

Şîrnak Baskını

Rîsala Biratiyê (Bi herfîn Erebî)

Peyiva Bîst û Seyemîn / S. Norsî

/ Osman Resulan

Di xwestinê we yêñ tevayî de, kitêbên Kurdî bi 30 %  
û kitêbên Tirkî bi 40 % erzanî têñ şandin.

(Toplu isteklerinizde Kürtçe kitaplarımız % 30,  
Türkçe kitaplarımız % 40 indirimle gönderilir.)

### Navnîşan (Adres)

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih/İstanbul

Tel: 533 75 88

